# HÎNKER

## Asta Yekemîn

Ronayî Onen
Samî Tan
Mevlut Aykoç
Sadik Varli



ENSTÎTUYA KURDÎ
STENBOL 1992

**Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê** 48
**Rêzeya Perwerdehiyê** 7

**Hînker - Asta Yekemîn** Ronayî Onen, Samî Tan, Mevlut Aykoç, Sadik Varli

**Berg & Rûpelsazî** Aysel Çetin
**Wênekêş** Şafak Liya
**Wêneyê li ser berg (Surên Amedê)** Ji arşîva DÎHA'yê

**Çapa Yekem** Sermawez 2008

**Çapxane** Berdan Matbaacılık
Davutpaşa Cad. Güven San. Sit.
C-Blok No: 215-216 Topkapı/İST
Tel: (0212) 613 12 11

**ISBN** 978-975-6282-45-8

© Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê

ZEND BİLİM KÜLTÜR EĞİTİM BASIN YAYIN LTD. ŞTİ.
Mesihpaşa Mah. Ordu Cad. Hadi Han, No: 305/5 Eminönü - İST
Tel: (0212) 518 70 42 Fax: (0212) 518 70 43

**Web** www.enstituyakurdi.org **E-Mail** info@enstituyakurdi.org

# HÎNKER

## Asta Yekemîn

Ronayî Onen | Samî Tan
Mevlut Aykoç | Sadik Varli

ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

# NAVEROK Û PLAN


| UNÎTE | MIJAR | RÊZIMAN | ARMANC | PEYV, ALAV Û NAVGÎN |
|---|---|---|---|---|
| 1 NASÎN | A-Hevnasîn 4-5<br>B-Rojbaş 6<br>C-Alfabe 7<br>D-Nasîna kes û tîştan 8-11<br>E-Rêziman<br>1-Cînavkên kesane 12<br>2-Qertafên kesane 12<br>3-Cînavkên kesane yên tewandî 12<br>4-Cînavkên şanîdanê yên xwerû 12<br>5-Cînavkên pirsiyarî yên xwerû 13<br>**UNÎTE 1- SPARTEK 13-15** | 1-Cînavkên kesane<br>2-Qertafên kesane<br>3-Cînavkên kesane yên Tewandî<br>4-Cînavkên şanîdanê yên xwerû<br>5-Cînavkên pirsiyariyê yên xwerû | 1-Dê bi vê unîteyê hînî hin hevokên bingehîn bibin.<br>2-Dê bikaribin xwe bidin nasîn û hevalên xwe nas bikin. | 1-Navên alav û navgînên di fêrgehê de |
| 2 MALBAT | A-Danasîna ferdên malbatê 16<br>B-Hejmar 17<br>C-Hene/Heye 18<br>D-Danasîna Xizman 19-21<br>E-Danasîna heval û hogiran 22<br>F-Kar û Pîşe 23-25<br>G-Rêziman<br>1-Qertafên nebinavkirinê 26<br>2-Veqetandekên binavkirî 26<br>3- Veqetandekên nebinavkirî 26<br>**UNÎTE 2- SPARTEK 27-30** | 1-Qertafên nebinavkirinê<br>2-Veqetandekên binavkirî<br>3- Veqetandekên nebinavkirî | 1-Dê hewl bidin ku peyv û hevokên bi hevaltî, dostî û xizmantiyê ve girêdayî nas bikin.<br>2-Dê hejmaran hîn bibin. | 1-Navê xizman<br>2-Hejmar<br>3-Navê pîşeyan |
| 3 DEM Û SAL | A-Dem<br>1-Demsal 31<br>2-Navên Mehan 32<br>3-Navên Rojan 32<br>4-Danên Rojan 32<br>B-Roj, Cîhan û hîv 32<br>C-Rojeke Dîlanê 33<br>D-Bernameya Dîlanê ya heftane 34-35<br>E-Rêziman<br>1-Dema Niha 36<br>2-Tewang 37<br>**UNÎTE 3- SPARTEK 38-41** | 1-Dema Niha<br>2-Tewang | 1-Dê navên demsal, meh, roj û danên rojê hîn bibin.<br>2-Dê hinek peyv û têgihên bi roj, cîhan û hîvê ve girêdayî hîn bibin. | 1-Navê roj, meh û danên rojê<br>2-Peyvên rojane têne bikaranîn |
| 4 PÊDIVÎ | A-Li Malê<br>1-Danên Xwarinê 42<br>2-Daxwazên Dilşayê ji Dîlanê 43<br>3-Biçe Dikanê 43<br>B-Rêziman<br>1-Raweya Fermanî 44<br>C-Li Sûkê<br>1-Navên sebze û fêkiyan 45<br>2-Rodî Fêkiyan dikire 46<br>3-Kiriyarî 47<br>D-Cil û Berg 48<br>1- Li firoşgeha cil û bergan 49<br>2- Evîn li fîstanekî biçûktir digere. 51<br>E-Rêziman<br>1-Payeya Rengdêran 51-52<br>2-Raweya Xwestekî 53<br>3-Hejmar 53<br>**UNÎTE 4-SPARTEK 54-56** | 1-Payeya Rengdêran<br>2-Raweya Xwestekî<br>3-Hejmar | 1-Dê peyv û hevokên bi jiyana rojane ve girêdayî hîn bibin.<br>2-Dê navê sebze, fêkî û cil û bergan hîn bibin.<br>3-Dê hewl bidin ku sûkê nas bikin. | 1-Navê Sebze û fêkiyan<br>2-Navê cil û bergan |

# NAVEROK Û PLAN


| UNÎTE | MIJAR | RÊZIMAN | ARMANC | PEYV, ALAV Û NAVGÎN |
|---|---|---|---|---|
| 5 JIYAN | A-Serê Sibê 57<br>B-Di rê de 58<br>C-Li dibistanê<br>1-Bernameya Hefteyî 59<br>2-Di fêrgehê de 60<br>D-Çûna Sînemayê 61<br>E-Saet 62<br>F-Rêziman<br>1-Dema bê 63<br>UNÎTE 5- SPARTEK 64-66 | 1-Dema bê | 1-Dê hewl bidin ku peyv û hevokên rojane têne bikaranîn hîn bibin.<br>2-Dê saetê nas bikin û bikaribin saetê bipirsin û pirsên di der barê saetê de bibersivînin. | 1-Navên wane û navgînên di dibistanê de |
| 6 HOBÎ | A-Çûna Şanoyê 67<br>B-Guhdariya Muzîkê 68-69<br>C-Werzîş 70-71<br>D-Rêziman<br>1-Lêkera Karînê 72<br>E-Ez dikarim avjeniyê bikim 73<br>F-Azad çû Pirtûkxaneyê 74<br>G-Geşt û Seyran 75<br>H-Rêziman<br>1-Dema boriya têdeyî 76<br>UNÎTE 6- SPARTEK 77-79 | 1- Lêkera karîn<br>2- Dema boriya têdeyî | 1-Dê peyv, têgih û hevokên der barê şano, muzîk, geşt û seyran û werzîşê de hîn bibin û di jiyana rojane de bi kar bînin. | 1-Peyvên di muzîk, şano û werzîşê de têne bikaranîn. |
| 7 CÎH Û WAR | A-Cîhan 80<br>B-Bajar 81<br>C-Taxa me 82<br>D-Avahiya me 83<br>E-Odeya Hêlîne 84<br>F-Rêziman<br>1-Daçek 85<br>2-Peyvsazî 85<br>UNÎTE 7- SPARTEK 86-90 | 1-Daçek<br>2-Peyvsazî | 1-Dê peyv, têgih û hevokên têkildarî cîhan û bajêr hîn bibin û hewl bidin ku bi kar bînin.<br>2-Dê alavên di avahî û malê de hîn bibin û di jiyana rojane de bi kar bînin. | 1-Hinek peyvên di jiyana bajarvanî, tax û malê de têne bikaranîn.<br>2-Navên alavên di malê de. |
| 8 PÊŞKETIN | A-Têkberên elektronîk 95<br>1-Nasîna peyvan 96<br>2-Kirîna têkberan<br>3-Li malê têkberên elektronîk 97<br>B-Kompîtur û înternet 98<br>C- Weşana bi kurdî<br>1-Kî dizane? 99<br>2-Çapemeniya kurd 100<br>3-Radyo 101<br>4-Televîzyon 102<br>D-Rêziman<br>1-Dema boriya dûdar 103<br>2-Avaniya tebatî 104<br>UNÎTE 8- SPARTEK 105-107 | 1-Dema boriya dûdar<br>2-Avaniya tebatî | 1-Dê navên têkberên elektronîk hîn bibin.<br>2-Dê der barê pêşketinê de bibin xwedî agahî.<br>3-Dê peyv, têgih û hevokên bi kompîtur û înternetê ve têkildar hîn bibin.<br>4-Dê der barê çapemeniya kurd de bibin xwedî agahî. | 1-Navên têkberên elektronîk.<br>2-Peyvên di çapemeniyê de têne bikaranîn. |

# unîte 1 NASÎN

- hevnasîn
- rojbaş
- alfabe
- nasîna kes û tiştan
- rêziman

## A- Hevnasîn



### 1- Navê te çi ye? Navê min … e/ye.

**Dîlan** Rojbaş! Navê min Dîlan e. Navê te çi ye ?
**Azad** Rojbaş! Navê min Azad e.

### 2- Tu ji ku derê yî? Ez ji ……. me.

**Dîlan** Tu ji ku derê yî?
**Azad** Ez ji Amedê me. Lê tu?
**Dîlan** Ez jî ji Wanê me.

### 3- Tu çawa yî? Ez baş im.

**Diyar** Rojbaş Azad tu çawa yî?
**Azad** Zor spas, ez baş im. Lê tu?
**Diyar** Spas, ez jî baş im.




### 4- Cihên vala dagirin.

| | |
|---|---|
| **Azad** | Rojbaş Dîlan tu ......... yî? |
| **Dîlan** | Rojbaş Azad, .......... baş im, tu çawa ...........? |
| **Azad** | Ez jî baş ............, zor spas. Ev hevala min e. ........... wê Hêlîn e. |
| **Dîlan** | Merheba Hêlîn, tu çawa yî? |
| **Hêlîn** | Ez baş im, spas. |
| **Dîlan** | Hêlîn tu ji ......... derê yî? |
| **Hêlîn** | Ez ....... Mêrdînê me. |
| **Dîlan** | Ez bi nasîna te kêfxweş bûm. |
| **Hêlîn** | Ez jî. |

### 5- Vê diyalogê bixwînin û bi hev re li ser bixebitin.

| | |
|---|---|
| **Azad** | Rojbaş! Navê min Azad e. Navê te çi ye? |
| **Dîlan** | Rojbaş! Navê min Dîlan e. |
| **Azad** | Tu ji ku derê yî Dîlan? |
| **Dîlan** | Ez ji Wanê me. Lê tu? |
| **Azad** | Ez jî ji Agiriyê me. |
| **Dîlan** | Ez bi nasîna te kêfxweş bûm. |
| **Azad** | Ez jî. |

### 6- Valahiyen li jêr dagirin.

| | |
|---|---|
| **Azad** | Rojbaş navê ....... çi ye? |
| **Hêlîn** | Rojbaş navê ...... Hêlîn e. ........ te çi ye? |
| **Azad** | Navê min ........... e. |
| **Hêlîn** | Tu ji ............ derê yî? |
| **Azad** | Ez ........... Amedê me. Lê tu? |
| **Hêlîn** | ......... ji Mêrdînê me. |

### 7- Li gorî xwe valahiyên li jêr dagirin.


Navê te çi ye?
Navê min ........... e/ye.
Tu ji ku derê yî?
Ez ji ............ me.

### 8- Du heval bên bal hev cihên vala li gorî xwe dagirin.

| | |
|---|---|
| **A** | Rojbaş, navê min ................. e/ye. Navê te çi ye? |
| **B** | Rojbaş, navê min .... ..........e/ye. |
| **A** | Tu ji ku derê yî? |
| **B** | Ez ji ...................... me. Lê tu? |
| **A** | Ez ji .................. me. |
| **B** | Ez bi nasîna te kêfxweş bûm. |
| **A** | Ez jî. |

## B- Rojbaş



















## C- Alfabe

Tîpên girdek

A B C Ç D E Ê F G H I Î J K L M N O P Q R S Ş T U Û V W X Y Z

Tîpên hûrdek

a b c ç d e ê f g h i î j k l m n o p q r s ş t u û v w x y z

Tîpên dengdar

b c ç d f g h j k l m n p q r s ş t v w x y z

Tîpên dengdêr

a e ê i î o u û

Pevdeng

xw

| | |
|---|---|
| A a | agir, av, ax |
| B b | bar, ber, aborî |
| C c | cîran, îcar, cil |
| Ç ç | çav, çar, çêr |
| D d | dev, derî adar |
| E e | erd, zer, ewr |
| Ê ê | êzing, êvar, kêr |
| F f | find, berf, heft |
| G g | gore, gul, agir |
| H h | herî, hest, guh |
| I i | incas, diran, bivir |
| Î î | îsot, dîk, derî |
| J j | jin, jûjî, roj |
| K k | kevok, hêk, kum |
| L l | lepik, lêv, pel |
| N n | nan, hinar, ken |
| O o | ol, por, to |
| P p | pel, ap, dapîr |
| R r | roj, tor, şêr |
| S s | sêv, hesin, tas |
| Ş ş | şeh, şimik, aş |
| T t | tav, tembûr, xet |
| U u | utî, gul, du |
| Û û | ûr, şûr, tû |
| V v | vizik, av, çav |
| W w | werdek, dew, kew |
| X x | xelat, ax, xanî |
| Y y | yek, keya, yar |
| Z z | zik, kezik, kezî |
| X W | xwarin, vexwarin, xwê |

## D- Nasîna kes û tiştan

### 1- Ev / ew kî ye?

Ev Azad e.



Ev Dîlan e.



Ew kî ye?

Ew Rojda ye.



## 2- Ev / ew çi ye?

Ev kompîtur e.



Ew kursî ye.



Ev → (nêzîk) Ew → (dûr)

Ev kursî ye.



Ev mase ye.



Ew kursî ye.

Ew mase ye.





**3- Navên van tiştan li bin wan binivîsin.**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| lênûsk | kursî | jêbir | nexşe | kaxiz | qelemtraş | pênûsdank | kilspî |
| pênûs | dep | çente | rastkêş | demjimêr | ferheng | pirtûk | |



1)......................



2)......................



3)......................



4)......................



5)......................



6)......................




7)......................



8)......................



9)......................



10)......................



11)......................



12)......................



13)......................



14)......................

# 4- Ew Azad e?


Ew Azad e?
Erê, ew Azad e.


Ew Bermal e?
Na, ew ne Bermal e. Ew Dîlan e


Navê te Azad e?
Erê, navê min Azad e.
Navê te Lezgîn e?
Na, navê min ne Lezgîn e. Navê min Ferzende ye.

## E- Rêziman

# Cînavk

### 1- Cînavkên kesane yên xwerû

Ez
Tu
Ew
Em
Hûn
Ew

### 2- Qertafên kesane

-im/me
-î/yî
-e/ye
-in/ne
-in/ne
-in/ne

**Mînak**

| | | |
|---|---|---|
| Ez | têr | im. |
| Tu | | î. |
| Ew | | e. |
| Em | | in. |
| Hûn | | in. |
| Ew | | in. |

| | | |
|---|---|---|
| Ez | birçî | me. |
| Tu | | yî. |
| Ew | | ye. |
| Em | | ne. |
| Hûn | | ne. |
| Ew | | **ne.** |

**Ez** Berdan **im**.
**Ez** Gulê **me**.
**Tu** Zozan **î**.
**Tu** Zînê **yî**.
**Ew** xwendekar **e**.
**Ew** mamoste **ye**.
**Em** xwendekar **in**.
**Em** mamoste **ne**?
**Hûn** xwendekar **in**?
**Hûn** mamoste **ne**.
**Ew** xwendekar **in**.
**Ew** mamoste **ne**.

### 3- Cînavkên kesane yên tewandî

Min
Te
Wî (nêr)
wê(mê)
Me
We
Wan

**Mînak**

Bavê **min** mamoste ye.
Xalê **te** ajokar e.
Apê **wî** hunermend e.
Xalê **wê** ajokar e.
Karê **me** baş e.
Hevalên **we** parêzer in.
Ev xwîşka **wan** e.

### 4- Cînavkên şanîdanê yên xwerû

| **Ev (nêzîk)** | **Ew (dûr)** |
|---|---|
| Ev pênûs e. | Ew rojname ye. |
| Ev pênûs in. | Ew rojname ne. |

### 5- Cînavkên pirsiyarî yên xwerû

## Kî

Ez **kî** me?
Tu **Zozan** î.
Tu **kî** yî?
Ez **Gulê** me.
Ew **kî** ye?
Ew **Zîlan** e.

Em **kî** ne?
Hûn **Azad û Dîlan** in.
Hûn **kî** ne?
Em **Bager û Zînê** ne.
Ew **kî** ne?
Ew **Bawer û Mem** in.

| | |
|---|---|
| Tu kî yî? | Ez Piling im. |
| Tu kî yî? | Ez Hêja me |
| Ev kî ye? | Ev Rênas e. |
| Ev kî ye? | Ev Gulê ye. |
| Ew kî ye? | Ew Qenco ye. |


## Çi

Ev **çi** ye?
Ev **lênûsk** e.
Ev **çi** ne?
Ev **jêbir** in.

Ew **çi** ye?
Ew **dep** e.
Ew **çi** ne?
Ew **çente** ne.

## A - Xebata li ser peyvan

### 1- Li gorî wêneyan xaçepirsê dagirin.




### 2- Nêçîra peyv û komepeyvan

1. ŞEVBAŞ..........................
2. ....................................
3. ....................................
4. ....................................
5. ....................................
6. ....................................
7. ....................................
8. ....................................
9. ....................................
10. ...................................
11. ...................................

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | **Ş** | **E** | **V** | **B** | **A** | **Ş** | T | Ş | D |
| P | I | R | T | Û | K | O | U | E | A |
| M | O | I | R | O | J | B | A | Ş | U |
| A | E | C | D | Ç | F | R | T | L | X |
| M | Û | D | A | M | A | S | E | Ê | Y |
| O | L | Ê | N | Û | S | K | K | T | J |
| S | X | W | E | N | D | E | K | A | R |
| T | R | A | Y | W | K | L | M | D | T |
| E | K | I | L | S | P | Î | K | L | D |
| B | I | X | J | Ê | B | I | R | T | E |
| A | O | E | S | P | A | S | S | I | P |

# B- Bikaranîna zimên

### 1- Cihên vala dagirin.

**Perwîn** Rojbaş!. .... min Perwîn ...... Navê te ... ye?
**Pêlîn** Navê ....... Pêlîn e!
**Perwîn** Pêlîn tu ji ...... derê ......?
**Pêlîn** Ez ..... Mêrdînê ...... Lê tu?
**Perwîn** Ez ..... Çewlikê ......
**Pêlîn** Ez ..... nasîna te ...... bûm.
**Perwîn** Ez ......

### 2- Cihên vala dagirin.

**Pelşîn** Êvarbaş!
**Perwîn** ............, Pelşîn!
**Pelşîn** Tu ........... yî?
**Perwîn** .......... baş .......... Lê tu?
**Pelşîn** ........ jî ............. im .

### 3- Hevokên her du koman ên hev temam dikin bigihînin hev.

**1.** Rojbaş!
**2.** Navê te çi ye?
**3.** Ez bi nasîna te kêfxweş bûm.
**4.** Tu çawa yî?
**5.** Tu ji ku derê yî?

**a.** Ez ji Rihayê me.
**b.** Ez jî.
**c.** Ez baş im.
**d.** Rojbaş !
**e.** Navê min Sernaz e.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| d | | | | |

### 4- Cihên vala dagirin.

**Dîlan** Ev ................... ye?
**Azad** Ev Lezgîn ......

**Pelda** Tu ...... yî ?
**Pelşîn** Ez ............. im.

**Dîlan** Tu ........... î ?
**Azad** Belê, ez Azad ......

**Dîlan** .........kî ye ?
**Azad** Ew Bêrîvan ......

**Evîn** Ew Rizgar e?
**Şervan** Na, ...... ne ......e.

**Dîlan** .......... kî ne ?
**Azad** Ew .............. û Şervan in

### 5- Cihên vala dagirin.

**Dîlan** Ev ……. ye ?
**Azad** Ev mase ye.



**Dîlan** Ev ….. ye ?
**Azad** Ev lênûsk ......



**Evîn** Ev çi ……?
**Şervan** …… pênûs in.



**Dîlan** Ew çi…….?
**Azad** …….. pirtûk in.



**Dîlan** Ew çi …. ?
**Azad** ….. pênûs e.



### 6- Pirsên bersivên li jêr binivîsin.

| Pirs | Bersiv |
|---|---|
| 1…………….......……? | Navê min Berzan e. |
| 2…………….......……? | Ez Berdan im. |
| 3…………….......……? | Ez ji Wanê me. |
| 4…………….......……? | Lezgîn ji Amedê ye. |
| 5…………….......……? | Ew mizgeft e. |
| 6…………….......……? | Ev lênûsk e. |
| 7…………….......……? | Em ji Mêrdînê ne. |
| 8…………….......……? | Ew Lezgîn e. |
| 9…………….......……? | Ev Gulbîn e. |
| 10…………….......…..? | Ew pirtûk in. |

## C- Hîndariyên rêzimanî

### 1- Cihên vala bi " e" an jî "ye" dagirin.

**Rojda** Navê min Rojda ...........
**Cindî** Navê min Cindî ............
**Dilêr** Navê min Dilêr .........
**Berfîn** Navê min Berfîn ...........
**Besna** Navê min Besna .........
**Delal** Navê min Delal ...........

### 2- Cihên vala dagirin.

**1.** Ez nexweş im
**2.** Tu nexweş ……….
**3.** Ew nexweş …………
**4.** Em nexweş …………
**5.** Hûn nexweş …………
**6.** Ew nexweş …………..

### 3- Cihên vala dagirin.

**1.** Ez gundî me
**2.** Tu gundî ………….
**3.** Ew gundî …………….
**4.** Em gundî …………….
**5.** Hûn gundî …………...
**6.** Ew gundî …………….

# unîte 2 MALBAT

‣ ferdên malbatê ‣ hejmar ‣ heye/hene ‣ xizm ‣ heval ‣ kar û pîşe ‣ rêziman

## A- Danasîna ferdên malbatê



Malbata Dîlanê

Di mala me de heft kes hene. Diya min, bavê min, xwîşka min, birayê min, dapîr û bapîrê min û ez. Navê bavê min Rodî ye. Ew parêzer e. Navê diya min Dilşa ye. Ew bijîşk e. Navê birayê min Serhat e. Ew xwendekar e. Navê xwîşka min Pelîn e. Ew hîn piçûk e. Navê bapîrê min Qenco ye, navê dapîra min jî Xecê ye.

**Pirsên jêrîn li gorî diyaloga jorîn bibersivînin.**

**1)** Di mala Dîlanê de çend kes hene?

.............................................

**2)** Rodî kî ye?

.............................................

**3)** Navê diya Dîlanê çi ye?

.............................................

**4)** Çend xwîşk û birayên Dîlanê hene?

.............................................

**5)** Navê dapîra Dîlanê çi ye?

.............................................

**6)** Qenco kî ye?

.............................................

## B- Hejmar

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 (yek) | 2 (du) | 3 (sê) | 4 (çar) | 5 (pênc) | 6 (şeş) | 7 (heft) | 8 (heşt) | 9 (neh) | 10 (deh) |

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| 11 (yazdeh) | 12 (dozdeh) | 13 (sêzdeh) | 14 (çardeh) | 15 (pazdeh) | 16 (şazdeh) | 17 (hefdeh) |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 18 (hejdeh) | 19 (nozdeh) | 20 (bîst) | 21 (bîst û yek) | 22 (bîst û du) |

## 1- Tu çend salî yî?




**2- Pirsên jêrîn li gorî diyaloga li rex bibersivînin.**

**1.** Hêlîn çend salî ye?

....................................

**2.** Dîlan çend salî ye?

....................................

**3- Du heval bên bal hev diyaloga li jêr li gorî xwe dagirin.**

**A** .........., tu çend salî yî?

**B** Ez ....... salî me. Lê tu?

**A** Ez .......... salî me.

## C- Heye / Hene

### 1- Çend xwîşk û birayên te hene?



**Diyar** Çend xwîşkên te hene?
**Azad** Sê xwîşkên min hene.
**Diyar** Çend birayên te hene?
**Azad** Birayekî min heye. Çend xwîşk û birayên te hene?
**Diyar** Xwîşkek û du birayên min hene.


### Pirsên jêrîn li gorî diyaloga jorîn bibersivînin.

1. Çend xwîşkên Azad hene?
   ......................................
2. Çend birayên Azad hene?
   ......................................
3. Çend xwîşk û birayên Diyar hene?
   ......................................












## D- Danasîna xizman

### 1- Xizmên Dîlanê

Ev diya min e.
Navê wê Dilşa ye.



Ev bavê min e.
Navê wî Rodî ye.



Ev birayê min e.
Navê wî Serhat e.



Ev xwîşka min e.
Navê wê Pelîn e.



Ev xaltîka min e.
Navê wê Evîn e.



Ev bapîrê min e.
Navê wî Qenco ye.



Ev dapîra min e.
Navê wê Xecê ye.



Ev meta min e.
Navê wê Kewê ye.



Ev dotmama min e.
Navê wê Xunav e.



Ev apê min e. Navê
wî Ferzende ye.



Ev xalê min e.
Navê wî Sertac e.



**2- Cihên vala li gorî agahiyên her du rûpelên pêşîn dagirin.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| bûra | tî | hevjîn | bapîr | birazî |
| bûk | nevî | xwarzî | xwîşk | |



1) Qenco .......... Dîlanê ye.



2) Serhat ..... Ferzende ye.



3) Dilşa ............... Xecê ye.



4) Sertac ............. Rodî ye.



5) Pelîn ........... Qenco ye.



6) Dîlan ............. Sertac e.



7) Kewê .............. Rodî ye.



8) Ferzende .... Dilşayê ye.



9) Xecê ............ Qenco ye.

## E- Danasîna heval û hogiran




### 1- Azad fêrgeh û hevalên xwe dide nasîn

Navê min Azad e. Ez hejdeh salî me. Niha ez xwendekarê dibistana amadehiyê me. Îsal ez di pola çaremîn de me. Di fêrgehê de em sih û pênc kes in. Hevdeh keç û hejdeh kur in. Ji bo her waneyê mamosteyek heye. Mamosteyê pola me Dildar e. Ew mamosteyê muzîkê ye. Ew pir jîr e. Di polê de hevala min a herî baş Dîlan e. Ew berpirsa fêrgeha me ye.

**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

**1.** Azad çend salî ye?

..............................................

**2.** Azad di pola çendemîn de ye?

..............................................

**3.** Di fêrgeha Azad de çend kes hene?

..............................................

**4.** Berpirsa fêrgehê kî ye?

..............................................

## F- Kar û pîşe

Ez mamoste me.



Ez endazyar im.



Ez karker im.



Ez bijîşk im.





Ew avahîsaz e.



Ew wênekêş e.

# 1- Delal kar û pîşeyên xizmên xwe dide nasîn.



Navê min Delal e. Ez xwendekar im. Ez deh salî me. Diya min mamoste ye. Navê wê Sosin e. Ew çil û heşt salî ye. Bavê min bazirgan e. Navê wî Hogir e. Ew pêncî û pênc salî ye.

Du birayên min hene. Birayekî min bijîşk e. Navê wê Bahoz e. Ew bîst û heşt salî ye. Birayekî min jî rojnamevan e. Navê wî Aso ye. Ew bîst û şeş salî ye.

Apekî min heye, navê wî Sîdar e, ew ajokar e. Dotmameke min heye. Navê wê Şîlan e. Ew hunermend e. Du pismamên min hene. Pismamekî min karker e, navê wî Hozan e. Pismakekî min jî firoşkar e. Navê wî Menal e.

### 1- Pirsên jêrîn li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

**1.** Sosin çi karî dike?

...............................................

**2.** Hogir çend salî ye?

...............................................

**3.** Çend birayên Delalê hene?

...............................................

**4.** Aso çi karî dike?

...............................................

**5.** Navê dotmama Delalê çi ye?

...............................................

**6.** Çend kurên Sîdar hene?

...............................................

### 2- Li gorî nivîsa jorîn cihên vala bi navên pîşeyan dagirin.

**1-** Sosin ......................... ye.

**2-** Hogir ............................ e.

**3-** Bahoz ......................... e.

**4-** Aso .............................. e.

**5-** Sîdar ............................... e.

**6-** Şîlan ............................... e.

**7-** Hozan ............................ e.

**8-** Menal ............................. e.

## 2-Tu çi karî dikî?






## G- Rêziman

### 1- Qertafên nebinavkirinê

-**ek** (yekjimar) zarok**ek**
-**in** (pirjimar) zarok**in**

**Valahiyên li jêr dagirin.**

**Mînak** Li ber mala me dar**ek** heye. / Li ber mala me dar**in** hene.

**1-** Li ser maseyê pirtûk... heye.
**2-** Di çente de lênûs... hene.
**3-** Di destê min de sêv... heye.
**4-** Di berîka min de gûz... hene.

### 2- Veqetandekên binavkirî

-**a** (yekjimar/mê) Met**a** min
-**ê** (yekjimar/ nêr) Bav**ê** min
-**ên** (pirjimar) Xwîşk**ên** min

**Valahiyên li jêr dagirin.**

**Mînak** Ew mamosteyê me ye. / Ev xwendekara min e.

**1-** Ev xwîşk... min e.
**2-** Ew ap... min e.
**3-** Ew heval... min in.
**4-** Ev xaltîk... min e.
**5-** Ev heval... min e.
**6-** Ew mamostey... me ye.

### 3- Veqetandekên nebinavkirî

/ -**eke** / (mê û yekjimar) Xwîşk**eke** min heye.
- **ekî** / (nêr û yekjimar) Biray**ekî** min heye.
/ - **ine** / (pirjimar) Heval**ine** me hene.

**Valahiyên li jêr dagirin.**

**1-** Xaniy... cîranê me heye.
**2-** Pisîk... wan hene.
**3-** Qenco mirov... hêja ye.
**4-** Sosin dayîk... dilovan e.
**5-** Dîlan keçik... delal e.
**6-** Pirtûk... me hene.

**4- Valahiyên li jêr bi qertafan dagirin.**

**-ek, -in, -a, -ê, -ên, -eke, -ekî, -ine**

**1-** Ev dayik.... min e.
**2-** Ew xal..... min e.
**3-** Du xaniy..... cîranê me hene.
**4-** Mirîşk...... wan hene.
**5-** Delal jin..... çeleng e.
**6-** Ew heval........ jêhatî ye.
**7-** Li ser maseyê pênûs...... heye.
**8-** Di çente de jêbir...... hene.

# A- Xebata li ser peyvan

### 1- Nêçîra peyvan

1. DAPÎR..............................
2. ......................................
3. ......................................
4. ......................................
5. ......................................
6. ......................................
7. ......................................
8. ......................................
9. ......................................
10. ......................................
11. ......................................
12. ......................................
13. ......................................

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **D** | R | B | Z | S | T | A | B | Q | X |
| **A** | X | A | L | W | Q | P | I | L | B |
| **P** | W | V | A | R | M | R | R | Y | E |
| **Î** | Î | S | D | D | E | K | A | G | X |
| **R** | Ş | M | O | S | T | E | Q | W | D |
| W | K | E | T | R | T | Ç | T | Y | Ê |
| Z | K | X | M | C | B | A | P | Î | R |
| X | R | L | A | W | C | V | B | N | A |
| Q | W | E | M | R | T | Y | U | P | R |
| P | I | S | M | A | M | D | F | G | H |
| W | X | A | L | T | Î | O | Ş | N | M |

### 2- Hevokên her du koman yên hev û du temam dikin bigihînin hev.

**1.** Xwîşka bavê mirov — **a.** xalê mirov e.
**2.** Keça apê mirov — **b.** meta mirov e.
**3.** Xwîşka diya mirov — **c.** xaltîka mirov e.
**4.** Birayê dayika mirov — **d.** dotmama mirov e.
**5.** Pismamê mirov — **e.** lawê apê mirov e.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| b | | | | |

# B- Hejmar

### 1- Hejmarên li jêr bi nivîskî binivîsin.

1 ........... 2 ........... 3 ........... 4 ........... 5...........
6 ........... 7 ........... 8 ........... 9 ........... 10 ...........
11 ........... 12 ........... 13 ........... 14 ........... 15...........
16 ........... 17 ........... 18 ........... 19 ........... 20 ........... 21 ...........

## C- Bikaranîna zimên

### 1- Cihên vala dagirin.

1 **Dîlan** Ev kî ye?
**Gulîzer** Ev diya ...... e.
**Dîlan** ........ wê çi ye ?
**Gulîzer** Navê ........ Dilşa ye.

2 **Dilba** Ew kî ye ?
**Gulbîn** Ew kekê min .....
**Dilba** .......... wî ...... ..... ?
**Gulbîn** Navê ...... Serdar ......
**Dilba** Serdar .......... salî ....... ?
**Gulbîn** .... pazdeh ...... ......

3 **Bahoz** Rojbaş, .......... te çi ye?
**Besna** ..........., navê min ...... ye. Navê te çi .....?
**Bahoz** Navê ..... Bahoz ......
**Besna** Tu çend ......... yî ?
**Bahoz** ........ yazdeh ......... me. Lê tu?
**Besna** ...... jî sêzdeh ......... ........

### 1- Hevokên her du koman ên hev temam dikin bigihînin hev.

**1.** Ev kî ye?
**2.** Ew çend salî ye?
**3.** Tu çend salî yî?
**4.** Navê kekê te çi ye?
**5.** Navê eta te çi ye?

**a.** Ez şazdeh salî me.
**b.** Navê kekê min Berdan e.
**c.** Ev Bahoz e.
**d.** Navê eta min Dilşa ye.
**e.** Ew bîst salî ye.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| c | | | | |

### 3- Cihên vala dagirin.

1 **Dilba** Çend xwîşkên .........
hene?
**Gulbîn** Du xwîşkên min ...............
**Dilba** ............. xwîşkên te çi ne?
**Gulbîn** Navê yekê Bihar, ...... ya
din jî Berfîn e.

2 **Dilba** Çend birayên te ............... ?
**Gulbîn** Birayekî ............... heye.
**Dilba** ............... birayê te çi ye ?
**Gulbîn** Navê .............. min Hogir e.

3 **Rojda** Çend xwîşk û birayên te ....?
**Zînê** Du xwîşkên ................ hene,
lê birayên min tune ne.
**Rojda** Navên wan çi ......?
**Zînê** Navên wan Mem û Zîn .......

## Danasîna Jiyan

Navê min Jiyan e. Ez pazdeh salî me. Ez xwendekarê lîseyê me. Ez di pola yekemîn de me. Em di fêrgehê de bîst û pênc kes in. Pazdeh keç û deh kur in. Ji bo her waneyekê mamosteyeke me heye. Ez di waneyên îngilîzî û matematîkê de zîrek im.

### 4- Hevokên her du koman li gorî nivîsara jorîn bigihînin hev

**1.** Navê wî
**2.** Jiyan
**3.** Ew di waneyên
**4.** Di fêrgehê de

**a.** Jiyan e.
**b.** bîst û pênc xwendekar hene.
**c.** îngilîzî û matematîkê de zîrek e.
**d.** xwendekar e.

| 1 | 2 | 3 | 4 |
|---|---|---|---|
| a | | | |

### 5- Valahiyên nivîsara li jêr temam bikin û bixwînin.

Navê min Zozan .... Ez rojnamevan .... Diya min bijîşk e. Bavê ... dîrokzan ..... Du xwîşkên min .... Xwîşka .......... a mezin endazyar e. Xwîşka min a biçûk jî xwendekar .... Apê ........... wêjevan e. Meta min mamoste ........... Dotmama ............ wênesaz e. Pismamekî min ...., ew jî nivîskar e.

### 6- Ji hevokên li jêr ji bo yên rast stûna (r) ji bo yên çewt stûna (ç) xêz bikin.

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Zozan xwendekar e. | | ✓ |
| 2 | Diya Zozanê endazyar e. | | |
| 3 | Bavê Zozanê dîrokzan e. | | |
| 4 | Xwîşka Zozanê bijîşk e. | | |
| 5 | Apê Zozanê wêjevan e. | | |
| 6 | Dotmama Zozanê hunermend e. | | |
| 7 | Pismamê Zozanê nivîskar e. | | |

## D- Hîndariyên rêzimanî

### 1- Cihên vala dagirin.

**1-**Navê te çi ye?
Navê ....... Gulbîn e.

**2-** Navê .... çi ye?
Navê min Ronahî ye.

**3-** Navê bavê te çi ye?
Navê ..... Qenco ye.

**4-** Navê diya te çi ye?
Navê ..... Xezal e.

**5-** Navê gundê we çi ye?
Navê gundê .... Hûrîg e.

**6-** Navê hevalên te çi ne?
Navê ....... Zozan û Berfîn in.

### 2- Cihên vala bi veqetandekên binavkirî dagirin.

**1-** Xwîşk.... min biçûk e.
**2-** Bira.... min mezin e.
**3-** Rostem.... Zal pehlewan e.
**4-** Kawa..... Hesinker serhildêr e.
**5-** Heval..... min zîrek in.
**6-** Sê bira...... min hene.
**7-** Ap.... min ajokar e.
**8-** Met..... wê perestar e.
**9-** Xal.... min karsaz in.
**10-** Bira...... min xwandekar in.
**11-** Pismam..... min karker in.
**12-** Bav... wî endazyar e.
**13-** Bira... min bijîşk e.
**14-** Dotmam.... min hunermend e.

### 3- Cihên vala bi veqetandekên nebinavkirî dagirin.

**1-** Xwîşk.... min heye.
**2-** Bira...... te heye.
**3-** Delal keç.... çardehsalî ye.
**4-** Malbata Delalê di xani..... biçûk de rûdinê.
**5-** Xal...... Delalê heye.
**6-** Met..... Delalê heye.
**7-** Heval...... Delalê pir baş in.
**8-** Xwîşk..... Zînê heye.
**9-** Bira...... Tacdîn heye.
**10-** Beko fesad..... pir xirab e.
**11-** Tacdîn heval...... fedakar e.

# unîte 3 DEM Û SAL

‣ dem ‣ roj, cîhan û hîv ‣ rojeke Dîlanê ‣ bernameya Dîlanê ‣ rêziman

## A- Dem

### 1- demsal



Di demsala biharê de hewa hêdî hêdî germ dibe. Baran dibare û kulîlk vedibin. Jiyana biharê xweş e.



Havîn germ e. Li gundan dema paletiyê ye. Havînê fêkî digihêjin. Havîn dema betlaneyê ye.



Zivistan sar e. Berf dibare. Av diqerise. Di zivistanê de jiyan zehmet e.



Piştî havînê payîz tê. Hêdî hêdî hewa sar dibe. Dibistan vedibin. Pelên daran diweşin.

## 2- navên mehan

| | | | |
|---|---|---|---|
| BIHAR | Adar | Avrêl | Gulan |
| HAVÎN | Pûşper | Tîrmeh | Gelawêj |
| PAYÎZ | Rezber | Kewçêr | Sermawez |
| ZIVISTAN | Berfanbar | Rêbendan | Reşemî |


## 3- navên rojan

şemî yekşem duşem sêşem çarşem pêncşem în

## 4- danên rojê

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| Berbang | Beyanî | Nîvro | Berêvar | Êvar | Şev |

## B- Roj, cîhan û hîv



Roj cîhanê germ dike.
Roj stêrkek e.



Cîhan li dora rojê dizivire.
Cîhan gerestêrkek e.



Hîv li dora Cîhanê dizivire.
Hîv peyka Cîhanê ye.

## C- Rojeke Dîlanê

Dîlan her roj serê sibê zû radibe.
Serçavên xwe dişo.
Taştêya xwe dixwe.
Piştre, ew bi serwîsê diçe dibistanê.
Waneyên wê nîvro diqedin.
Dîlan ji dibistanê derdikeve, tê malê.
Ew firavîna xwe li malê dixwe.
Heta berêvarê dema xwe bi çalakiyên cihêreng derbas dike.
Paşê vedigere malê.
Tevî malbata xwe şîvê dixwe.
Spartekên xwe çêdike, hinekî li televîzyonê temaşe dike û radikeve.



**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

1. Dîlan kengî radibe?

   ........................................

2. Dîlan piştî ku serçavên xwe dişo, çi dike?

   ........................................

3. Waneyên Dîlanê kengî diqedin?

   ........................................

4. Dîlan firavînê li ku dixwe?

   ........................................

5. Dîlan tevî kê şîvê dixwe?

   ........................................

6. Dîlan kengî spartekên xwe çêdike?

   ........................................

7. Piştî spartekan ew çi dike?

   ........................................

## D- Bernameya Dîlanê ya heftane

Dîlan ji çalakiyên hunerî û werzîşî pir hez dike. Lewma jî ew di nava hefteyê de beşdarî gelek çalakiyan dibe. Ew roja duşemê diçe avjeniyê. Dîlan di avjeniyê de gelek jêhatî ye. Roja sêşemê ew beşdarî xebatên şanoyê dibe. Kêfa wê gelekî ji şanoyê re tê. Dîlan roja çarşemê li malê dimîne. Roja pêncşemê dema xwe bi hevalên xwe re derbas dike. Roja înê diçe kursa gîtarê. Dawiya hefteyê jî li dersên xwe dixebite.



**Pirsên jêrîn li gorî nivîsa jorîn bibersivînin.**

1. Dîlan roja duşemê çi dike?

   ..........................................

2. Dîlan kîjan rojê beşdarî xebatên şanoyê dibe?

   ..........................................

3. Roja çarşemê Dîlan çi dike?

   ..........................................

4. Ew kîjan rojê dema xwe bi hevalên xwe re derbas dike?

   ..........................................

5. Dîlan roja înê diçe kursa çi?

   ..........................................


Dîlan wêneyan xêz dike.
Dîlan tenîsê dilîze.
Dîlan li gîtarê dide.
Dîlan basketbolê dilîze.
Dîlan pirtûkê dixwîne.
Dîlan bi hevalên xwe re diaxive.

## E- Rêziman

# 1- Dema Niha

### Forma erênî ya dema niha

| cînavk | qertafa dema niha | rayek | qertafa kesane | hevok |
|---|---|---|---|---|
| Ez | | | im | Ez diçim |
| Tu | | | î | Tu diçî. |
| Ew | di | ç | e | Ew diçe. |
| Em | | | in | Em diçin. |
| Hûn | | | in | Hûn diçin. |
| Ew | | | in | Ew diçin. |

### Forma neyînî ya dema niha

| lêker | qertafa dema niha | rayek | qertafa kesê/a yekemîn | forma dema niha | neyîniya dema niha |
|---|---|---|---|---|---|
| bûn | | b | | dibim | nabim |
| kirin | | k | | dikim | nakim |
| xwarin | | xw | | dixwim | naxwim |
| çûn | | ç | | diçim | naçim |
| hatin | | hê | | têm | nayêm |
| xwendin | di | xwîn | im | dixwînim | naxwînim |
| lîstin | | lîz | | dilîzim | nalîzim |
| şûştin | | şo | | dişom | naşom |
| vebûn | | ve-b | | vedibim | venabim |
| rabûn | | ra- b | | radibim | ranabim |
| vekirin | | ve-k | | vedikim | venakim |
| raketin | | ra- kev | | radikevim | ranakevim |
| çêkirin | | çê- k | | çêdikim | çênakim |

### Lekerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.

**1.** Ez niha rojnameyê ........... (xwendin)
**2.** Rojîn savarê ................. (na/ xwarin)
**3.** Tu çayê ......................... ? (vexwarin)
**4.** Em beyanî zû ...................... (rabûn)
**5.** Azad carinan ................ şanoyê. (çûn)
**6.** Hûn li televizyonê .....? (temaşe kirin)
**7.** Ez dereng ..................... (na/raketin)
**8.** Tu nameyê ...........................(nivîsîn)

## 2- Tewang

| Qertafên tewangê (ên binavkirî) | Mînak: |
|---|---|
| /-ê (mê) | Ez bêrîvan**ê** dibînim. |
| /-î (nêr) | Ew nan**î** dixwe. |
| /-an (pirjimar) | Emheval**an** dibînin. |

Ew mih**ê** didoşe.
Ew çêlek**ê** girêdide.
Ew dar**ê** av dide!
Ez av**ê** naxwazim.

Ez heval**î** nas dikim.
Tu nan**î** dixwî.
Ez mêvan**an** dibim malê.
Ez alîkariya karker**an** dikim.

### 1- Valahiyên li jêr bi qertafên tewangê yên binavkirî dagirin.

**1.** Ez niha rojname...... dixwînim.
**2.** Zîlan mast...... naxwe.
**3.** Em bi otobûs...... diçin dibistanê.
**4.** Ez her roj du sêv...... dixwim.

| Qertafên tewangê (ên nebinavkirî) | Mînak: |
|---|---|
| /-ekê (mê) | Ez darekê diçînim. |
| /-ekî (nêr) | Zelal kevirekî diavêje. |
| /-inan (pirjimar) | Em heval**inan** dibînin. |

Bar**ekî** giran dikeve ser milê wî.
Ez ê xaniy**ekî** ava bikim.
Gul**ekê** bide destan.

Sêv**ekê** bide min.
Ez car**inan** diçim sînemayê.
Heval**inan** ew anîne malê.

### 2- Valahiyên li jêr bi qertafên tewangê yên nebinavkirî dagirin.

**1.** Zarok li kûçik...... didin.
**2.** Hûn nan...... dikirin.
**3.** Ew sêv...... dixwin.
**4.** Tu name...... dinivîsî.

# A - Xebata li ser peyvan

## 1- Cihên vala bi van peyvan dagirin.

**payîz** **peyk** **sar** **berf** **fêkî** **kulîlk** **gerestêrk** **havîn**

**1-** Demsala ................ê germ e.
**2-** Di ................ê de pelên daran diweşin.
**3-** Di biharê de .............. vedibin.
**4-** Di zivistanê de ............ û baran dibarin.
**5-** Hîv .........a cîhanê ye.
**6-** ............ stêreke vemirî ye.
**7-** Sêv ......... ye.
**8-** Di zivistanê de hewa ........... e.

## 2- Navên mehan li gorî demsalan binivîsin

**Bihar** : ..................... ..................... .....................
**Havîn** : ..................... ..................... .....................
**Payîz** : ..................... ..................... .....................
**Zivistan** : ..................... ..................... .....................

## 3- Nêçîra peyv û komepeyvan

1. *PAYÎZ*..............................
2. ........................................
3. ........................................
4. ........................................
5. ........................................
6. ........................................
7. ........................................
8. ........................................

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| **P** | **A** | **Y** | **Î** | **Z** | W | Q | R | S | G |
| R | G | R | B | I | H | A | R | E | E |
| E | U | E | A | V | R | Ê | L | R | L |
| Ş | L | Ş | A | I | S | D | F | M | A |
| E | A | E | A | S | S | D | F | A | W |
| M | N | M | S | T | D | F | G | W | Ê |
| Î | S | Î | D | A | D | A | R | E | J |
| H | A | V | Î | N | A | S | D | Z | D |

**4- Cihên vala bi peyvên di nava qadê de dagirin.**

**dibistan havîn payîz biharê kulîlk baran germ sar**
**berf demsal fêkî pel**

Di salekê de çar ........... hene. Sala kurdî 21'ê adarê bi demsala ......... dest pê dike. Di biharê de .... vedibin, dinya geş û xweş dibe. Piştî biharê .... tê. Di havînê de dinya ....... dibe. Havînê ......... digihêjin. Li pey havînê........ tê. Di payîzê de ....... diweşin. ..... dibare, ......... vedibin. Zivistan ....... e. ..... dibare.

**5. Hevokên her du koman ên ku hev temam dikin bigihînin hev.**

**1.** Cîhan li dor
**2.** Adar
**3.** Bihar
**4.** Hîv
**5.** Yekşem
**6.** Cîhan
**7.** Roj

**a.** demsal e.
**b.** peyka cîhanê ye.
**c.** roja dawiya hefteyê ye.
**d.** rojê dizivire.
**e.** meheke biharê ye.
**f.** stêrkek e.
**g.** gerestêrkek e.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| d | | | | | | |

# B - Bikaranîna zimên

**1-Lêkerên li jêr li gor dema niha bikişînin.**

**1-** Ez ..... dibistanê (çûn).
**2-** Em ji malê ...... (hatin).
**3-** Dîlan ji mast hez ..... (na/kirin)
**4-** Sosin derî ....... (vekirin)
**5-** Hogir her êvarê zû ...... (raketin)
**6-** Zozan û Berfîn îro .... dibistanê (na/çûn)
**7-** Hûn li malê taştê ..... (na/xwarin)
**8-** Zozan destên xwe ...... (şûştin)
**9-** Tu tiştekî ....... (na /xwestin)
**10-** Gulşîn şîr ........ (vexwarin/na)

**2- Bi bêjeyên li jêr hevokan çêkin.**

**1-** tu car/ taştê/ ez/ naxwim ____________________
**2-** dijî/ Hêlîn/ Kerboranê/ li ____________________
**3-** dixwazin/em/azadiyê/ ____________________
**4-** li/ televîzyonê/tu/ temaşe dikî/? ____________________
**5-** ji/ avjeniyê/ ew/ hez dike ____________________
**6-** carinan/ em/ geştê/ diçin ____________________
**7-** bi şev /Jiyan/ dereng/ radikeve ____________________

**3- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.**

Mînak: Jêhat diçe dibistanê. (çûn)

Gulan her roj sibê zû ji xewê ……... (hişyarbûn)
Serçavên xwe …….. (şûştin)
Taştêya xwe ………... (xwarin)
Piştre, ew bi serwîsê ……. dibistanê (çûn)
Waneyên wê saet di duyan de ……... (qedîn)
Gulan ji dibistanê derdikeve, ……. malê. (hatin)
Heta berêvarê ew bi hevalên xwe re …….. (lîstin)
Piştî şîvê spartekên xwe …………. (çêkirin)
Paşê jî ……………… (raketin)

**4- Ji hevokên jêrîn ji bo yên rast stûna ( r ) ji bo yên çewt stûna ( ç ) xêz bikin.**

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Gulan serê sibê zû radibe | ✓ | |
| 2 | Gulan serê sibê serçavên xwe naşo. | | |
| 3 | Gulan li malê taştê dixwe. | | |
| 4 | Gulan bi peyatî diçe dibistanê. | | |
| 5 | Gulan ber bi êvarê vedigere malê | | |
| 6 | Gulan berî şîvê spartekên xwe çêdike. | | |

### 5-Van pirsan li gorî xwe bibersivînin.

**Mînak:**

*Tu li Mêrdînê dijî?*
*Erê, ez li Mêrdînê dijîm.*
*Na, ez li Mêrdînê najîm.*

1- Tu ji şanoyê hez dikî?

.....................................................

2- Bavê te mamostetiyê dike?

.....................................................

3- Tu li televîzyonê temaşe dikî?

.....................................................

4- Bavê te her roj taştê dixwe?

.....................................................

5- Dê û bavê te li Stenbolê dimînin?

.....................................................

6- Tu û hevalên xwe, (hûn) diçin sînemayê?

.....................................................

### 6- Cihên vala bi qertafên tewangê dagirin.

#### 1- Ên binavkirî

**/-ê/, /-î/, /-an/**

1- Deriyê mal...... veke.
2- Dar...... av bide. (pirjimar)
3- Ez ê gul...... bêhn bikim. (yekjimar)
4- Ew dixwaze heval...... bibîne. (pirjimar)
5- Ez ê biçim aş..... (yekjimar)
6- Zozan Rojan..... dibîne.
7- Rojan Zozan...... dibîne.
8- Tu çay......... vedixwî. (yekjimar)

#### 2- Ên nebinavkirî

**/-ekê/, /-ekî/, /-inan/**

1- Ew ê li vir bajar...... ava bikin.
2- Keç...... ev pirtûk da min.
3- Xort........ destmala min revand.
4- Ez ê ji we re pirtûk... bişînim. (pirjimar)
5- Ji me re sêv...... bîne. (pirjimar)
6- Ez her roj xox...... dixwim.
7- Bavê Delalê erebe.... dikire.
8- Dîlan li stran... guhdarî dike.

# unîte 4 PÊDIVÎ

▸ li malê ▸ rêziman ▸ li sûkê ▸ cil û berg ▸ rêziman

## A- Li malê

### 1- danên xwarinê

**Xurinî**: Danê xwarinê yê yekemîn e.

**Taştê**: Xwarina serê sibehê ye.

**Firavîn**: Xwarina nîvro ye.

**Şîv**: Xwarina êvarê ye.

**Paşîv**: Xwarina nîvê şevê ye.



**Dîlan** Ez dixwazim hêkekê bixwim.
**Pelîn** Ez şîr venaxim. Ez dixwazim îskanek çay vexwim.
**Dilşa** Şîr vexwe, zû mezin bibe.
**Serhat** Ez ji mêst hez dikim. Dayê mast tune ye?
**Dilşa** Heye kurê min.
**Serhat** Nanê qelandî bi mast re pir xweş e.
**Dîlan** Bi dimsê jî xweş e. Ez jê pir hez dikim.
**Serhat** Lê hingiv? Ew wekî derman e.
**Dîlan** To jî pir xweş e.
**Serhat** Hêkerûn û qelî jî pir xweş in.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Dîlan çi dixwaze ?
...............................................
2. Kî şîr venaxwe ?
...............................................
3. Kî ji mast hez dike ?
...............................................
4. Dîlan ji çi pir hez dike ?
...............................................
5. Li gorî kê hêkerûn û qelî pir xweş in?
...............................................

## 2- Daxwazên Dilşayê ji Dîlanê



Keça min. Ez niha diçim kar.
Tu jî nivînên xwe berhev bike.
Malê hinekî bide hev.
Hinek firaqên qirêjî hene, wan bişo.
Kincên şûştî ji cilşoyê derxe û raxe.
Odeya Serhat zêde belawela ye, destên xwe mede wir, bila ew bi xwe bide hev.

## 3- Biçe dikanê

| | |
|---|---|
| **Dilşa** | Kurê min ka were vir! |
| **Serhat** | Kerem bike dayê. |
| **Dilşa** | Mêvan tên, biçe dikanê û hinek tiştan bîne. |
| **Serhat** | Bibêje dayê, ez çi bînim? |
| **Dilşa** | Sê nan, du kîlo birinc, kîloyek goştê kutandî û kasikek mast bikire. |
| **Serhat** | Belê dayê, tiştekî din heye? |
| **Dilşa** | Na, tu van ji bîr meke bes e. |
| **Serhat** | Baş e. |
| **Dilşa** | Here û zû were. |



## B- Rêziman

# 1- Raweya Fermanî

| lêker forma raderî | qertafa fermanê | rayeka dema niha | qertafa kesane | forma fermanî | forma neyînî |
|---|---|---|---|---|---|
| Çûn | bi | ç | -e (yekjimar) | biçe/biçin | meçe/meçin |
| Xwestin | | xwaz | | bixwaze/bixwazin | mexwaze/mexwazin |
| Girtin | | gir | | bigire/bigirin | megire/megirin |
| Birin | | b | | bibe/bibin | mebe/mebin |
| Kirîn | | kir | -in (pirjimar) | bikire/bikirin | mekire/mekirin |
| Vekirin | - | vek | | veke/vekin | Vemeke/vemekin |
| Ragirtin | | ragir | | ragire/ragirin | Ramegire/ramegirin |
| Vebûn | | veb | | vebe/vebin | vemebe/vemebin |

# Hinek lêkerên awarte

| lêker | qertafa fermanê | rayek | qertafên kesane | forma fermanî |
|---|---|---|---|---|
| hatin | - | wer | e/in | were/werin |
| çûn | | her | | here/herin |
| anîn | bi | în | | bîne/bînin |
| gotin | | bêj | | bibêje/bibêjin |
| pehtin | | pêj | | bipêje/bipêjin |
| dîtin | | bîn | | bibîne/bibînin |

Karê xwe yê rojane bike!
Îskanek av bîne!
Kîloyek şekir bikire!

Karên xerab meke!
Li mêvanan derî veke!
Serma ye, paceyê bigire!!

**Lêkerên li jêr ji forma raweya fermanî bikin forma raderî.**

**Mînak**

melîzin lîstin

**1-** bike ..............
**2-** bîne ..............
**3-** bikire ..............
**4-** meke ..............

**5-** veke ..............
**6-** bigire ..............
**7-** bipêje ..............
**8-** bibirêje ..............

## 2- Raweya Xwestekî

| cînavkên kesane | lêkera alîkar | lêkera bingehîn |
|---|---|---|
| Ez | dixwazim/naxwazim | biçim. |
| Tu | dixwazî/naxwazî | biçî. |
| Ew | dixwaze/naxwaze | biçe. |
| Em | dixwazin/naxwazin | biçin. |
| Hûn | dixwazin/naxwazin | biçin. |
| Ew | dixwazin/naxwazin | biçin. |

| lêker (rader) | cînavkên kesane | lêkera alîkar (xwestin) | lêkerên bingehîn |
|---|---|---|---|
| kirin | Ez | dixwazim/naxwazim | bikim. |
| dan | Tu | dixwazî/naxwazî | bidî. |
| xwarin | Ew | dixwaze/naxwaze | bixwe. |
| standin | Em | dixwazin/naxwazin | bistînin. |
| firotin | Hûn | dixwazin/naxwazin | bifiroşin. |
| gerîn | Ew | dixwazin/naxwazin | bigerin. |

**Di hevokên jêrîn de valahiyan dagirin.**

**Mînak:** Ez dixwazim bilîzim.

**1.** Ez dixwazim sêvan ............ (xwarin)
**2.** Şîlan dixwaze kirasekî ............ (kirîn)
**3.** Tu .................(xwestin) çi bikî?
**4.** Em dixwazin kurdî ............. (hînbûn)

## 3 - Hejmar

(20-1000)

**21** bîst û yek
**22** bîst û du
**23** bîst û sê
**24** bîst û çar
**25** bîst û pênc
**26** bîst û şeş
**27** bîst heft
**28** bîst û heşt
**29** bîst û neh
**30** sî
**31** sî û yek

**10** deh
**20** bîst
**30** sî
**40** çil
**50** pêncî
**60** şêst
**70** heftê
**80** heştê
**90** nod
**100** sed
**101** sed û yek


**121** sed û bîst û yek
**200** du sed
**300** sê sed
**400** çar sed
**500** pênc sed
**600** şeş sed
**700** heft sed
**800** heşt sed
**900** neh sed
**999** neh sed û nod û neh
**1.000** hezar

## C- Li sûkê

### 1- Navên sebze û fêkiyan binivîsin.

**fêkî** alû **tû** xox **tiriyê zer** vîşne **hirmî** şemamok **hejîr** tiriyê reş **mandalîna** hinar **porteqal** sêv **zebeş** îsot

**sebze** **tûzik** bexdenûs **kartol** lîmon **pîvaz** mişmiş **fasûlî** firengî **gilgil** kelem **gêzer** balîcan **sîr** kundir **xiyar**



## 2- Rodî fêkiyan dikire




**Sertac** Sêv baş xuya dikin.
**Rodî** Ez dixwazim sê kîloyan bikirim.
**Sertac** Baş e, bistîne! Ez jî du kîloyan dikirim.
**Rodî** Tiriyê reş çawan e ?
**Sertac** Ew jî ne xirab e.
**Rodî** Ez du kîlo jî tiriyê reş dikirim.
**Sertac** Baş e, ez jî dixwazim kîloyek hinar bikirim.
**Rodî** Kîloyek firengî, baqek bexdanûs jî pêwîst in.
**Sertac** Pêwîstiya min bi baqek pîvazên ter heye.
**Rodî** Ez dixwazim çar heb xerpûşkan bikirim.
**Sertac** Wekî din pêwîstiya te bi çi heye?
**Rodî** Divê ez kartol, tivir, gizêr û sîrik jî bikirim.
**Sertac** Çima tu ev qas zêde sebze dikirî?
**Rodî** Mêvanên me hene.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Kî dixwaze sê kîlo sêv bikire ?

   ..............................................

2. Rodî çend kîlo tiriyê reş dikire?

   ..............................................

3. Kî kîloyek hinar dikire?

   ..............................................

4. Pêwistiya Sertac bi çi heye ?

   ..............................................

5. Rodî ji bo çi ev qas zêde sebze û fêkiyan dikire?

   ..............................................

## 3- Kiriyarî




**Rodî** Kîloya qidaman bi çendan e?
**Firoşkar** Bi du panotan e.
**Rodî** Ka ji kerema xwe du kîloyan bide.
**Firoşkar** Tu tiştekî din dixwazî?
**Rodî** Ez du kîlo jî dendikên gulan dixwazim.
**Firoşkar** Wekî din daxwazeke te heye?
**Rodî** Belê, lîtreyek jî ava fêkiyan. Hemû dike çiqas?
**Firoşkar** Bi tevahî dike 8 panot û nîv.
**Rodî** Kerem bike.
**Firoşkar** Keremdar be.

**a. Beşên hevokan bigihînin hev û hevokan temam bikin.**

**1.** Rodî ji firoşkar
**2.** Kîloya qidaman
**3.** Tiştên ku Rodî dikire
**4.** Rodî kîloyek
**5.** Rodî lîtreyek

**a.** bi tevahî dike heşt panot û nîv.
**b.** buhayê qidaman dipirse.
**c.** ava fêkiyan dixwaze.
**d.** bi du panotan e.
**e.** dendikên gulan dikire.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| b | | | | |

## b- Têgeh û peyvên kiriyariyê

| Pirs | bersiv |
|---|---|
| Kîloya mûzan bi çi ye? | Kîloya mûzan bi sê panot û nîvan e. |
| Nîv kîlo bindeq çiqas digire? | Nîv kilo bindeq bi neh panotan e. |
| Ev bi çend panotan e ? | Ev bi pazdeh panotan e. |
| Libek kelem bi çiqasî ye? | Libek kelem bi çar panotan e. |
| 250 gram kakilê gûzan çiqas digire ? | 250 gram kakilê gûzan pênc panot digire. |

## D- Cil û berg

**1- Navên cilan li bin wêneyan binivîsin.**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| fîstan | dêre | derpê | kurtek | şal | sol | şimik |
| sako | palto | lepik | gore | binkiras | | |



1)........................



2)........................



3)........................



4)........................



5)........................



10)........................



6)........................



7)........................



8)........................



9)........................



11)........................



## 2- Li firoşgeha cil û bergan

**Evîn** Reyona cil û bergên jinan li qata çendan e?
**Peywirdar** Kerem bikin qata herî jor e.
**Zozan** Spas.
**Evîn** Ez dixwazim ji xwe re fîstanekî gulgulî bikirim. Tu çi dixwazî?
**Zozan** Ez jî dixwazim ji xwe re dêreyeke sor bikirim.
**Evîn** Ev dêre çawan e, gelo bi dilê te ye?
**Zozan** Erê, gelekî xweşik e. Ez li xwe bikim, ka li min dibe yan na?
**Evîn** Baş e, ez jî çavên xwe li fîstanekî gulgulî bigerînim.
**Zozan** Gelo ev çawa ye, li min tê?
**Evîn** Erê, pir baş li te tê.
**Zozan** Baş e, ez vê dêreyê dikirim. Tu çi dikî?
**Evîn** Ez jî vî fîstanî diceribînim.
**Zozan** Baş e, ez li hêviya te me.
**Evîn** Ev piçekî fireh e, ez yekî biçûktir dixwazim.
**Zozan** Bipirse ka yekî biçûktir heye.
**Evîn** Belê, ez bipirsim bê ka yekî biçûktir nîn e.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Reyona cil û bergên jinan li qata çendan e?
..................................................
2. Evîn fîstanekî çawa dixwaze?
..................................................
3. Zozan dixwaze çi bikire?
..................................................
4. Dêre li bejna Zozanê tê?
..................................................
5. Evîn çima fîstên nakire?
..................................................

## 3- Evîn li fîstanekî biçûktir digere.

**Evîn** Gelo fîstanekî biçûktir heye?
**Peywirdar** Na, mixabin fistanê biçûktirîn ew e.
**Evîn** Kêfa min gelekî ji vî fîstanî re tê, lê hinekî fireh e.
**Peywirdar** Em yekî tengtir ji te re bînin.
**Evîn** Kengê tê?
**Peywirdar** Herî zêde di nava sê rojan de em tînin.
**Evîn** Ji sê rojan zûtir nayê?
**Peywirdar** Herî kêm di nava du rojan de em dikarin bînin.
**Evîn** Baş e. Ez piştî du rojên din têm.
**Peywirdar** Wekî din tu tu tiştî dixwazî?
**Evîn** Na, gelek spas. Bila dereng nemîne bes e.



## E- Rêziman

# 1- Payeya rengdêran

### a) hevrûkirina rengdêran

| Rengdêr | Mînak | Hevrûkirin | Mînak |
|---|---|---|---|
| mezin | fîstanê mezin | mezintir | fîstanê mezintir |
| biçûk | dêreya biçûk | biçûktir | dêreya biçûktir |
| bilind | bejna bilind | bilintir | bejna bilintir |
| nizm | xaniyê nizm | nizmtir | xaniyê nizmtir |
| xweş | xwarina xweş | xweştir | xwarina xweştir |
| dilgeş | keça dilgeş | geştir | keça dilgeştir |
| xemgîn | kurê xemgîn | xemgîntir | kurê xemgîntir |

### b) Payeya berztirîn forma yekem

| Rengdêr | Mînak | Payeya berztirîn | Mînak |
|---|---|---|---|
| mezin | fîstanê mezin | mezintirîn | fîstanê mezintirîn |
| biçûk | dêreya biçûk | biçûktirîn | dêreya biçûktirîn |
| bilind | bejna bilind | bilintirîn | bejna bilintirîn |
| nizm | xaniyê nizm | nizmtirîn | xaniyê nizmtirîn |
| xweş | xwarina xweş | xweştirîn | xwarina xweştirîn |
| dilgeş | keça dilgeş | dilgeştirîn | keça dilgeştirîn |
| xemgîn | kurê xemgîn | xemgîntirîn | kurê xemgîntirîn |

### c- Payeya berztirîn forma duyem

| Rengdêr | Mînak | Payeya berztirîn | Mînak |
|---|---|---|---|
| mein | fîstanê mezin | herî mezin | fîstanê herî mezin |
| biçûk | dêreya biçûk | herî biçûk | dêreya herî biçûk |
| bilind | bejna bilind | herî bilind | bejna herî bilind |
| nizm | xaniyê nizm | herî nizm | xaniyê herî nizm |
| xweş | xwarina xweş | xweş | xwarina herî xweş |
| dilgeş | keça dilgeş | herî dilgeş | keça herî dilgeş |
| xemgîn | mirovê xemgîn | herî xemgîn | mirovê herî xemgîn |

**2- Cihên vala bi rengdêrên hevrûkirî dagirin.**

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| biçûk | nerm | kurt | tirş | bilind |
| dirêj | şîrîn | mezin | hişk | nizm |



1) Kûsî ji kêrgoşkan **hêdîtir** in.
Kêrgoşk ji kûsiyan **lezgîntir** in.



2) Çiyayê Agirî ji Çiyayê Gebarê ............. e.
Çiyayê Gebarê ji Çiyayê Agirî ............. e.



3) Pirteqal ji sêvan.............................. in.
Sêv ji pirteqalan .............................. in.



4) Mişk ji fîlan .................................... in.
Fîl ji mişkan .................................... in.



5) Zurafa ji hirçan .................................. in.
Hirç ji zurafayan ................................ in.



6) Berû ji gûzan .................................. in.
Gûz ji berûyan ................................. in.

# A - Xebata li ser peyvan

### 1- Navên tiştên di wêneyan de li bin wan binivîsin.

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| firengî | tirî | zebeş | alû | balîcan | tivir | vîşne | kelem | zerdelî | gûz |


1)......................



2)......................


3)......................


4)......................


5)......................


6)......................


7)......................


8)......................


9)......................


10)......................

### 2- Van cil û bergan li gorî tabloya li jêr ji hev veqetînin.

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| fîstan | dêre | derpê | kurtek | şal | sol | şimik | kiras |
| binkiras | sako | palto | suxme | lepik | gore | deling | laçik |



## B- Bikaranîna zimên

### 1- Valahiyên diyaloga li jêr temam bikin û bixwînin.

**zebeşekî** **digire** **kîlo** **tirî** **panot** **çend**

| | |
|---|---|
| **Rodî** | Ji kerema xwe ............... bide! |
| **Fêkîfiroş** | Ev baş e ? |
| **Rodî** | Belê, baş e. ...........kîlo tê? |
| **Fêkîfiroş** | Pênc ....... ye. Tirî jî dagirim? |
| **Rodî** | Belê, du kîlo jî ......... bikişîne. |
| **Fêkîfiroş** | Wekî din tiştekî dixwazî? |
| **Rodî** | Na, spas! Hemû li ser hev çiqasî ............? |
| **Fêkîfiroş** | Hemû dike 23 ........ û 75 quriş. |
| **Rodî** | Kerem bike. |
| **Fêkîfiroş** | Keremdar be. |

### 2- Li gorî diyaloga li jor beşên hevokan bigihînin hev û hevokan temam bikin.

**1.** Rodî ji dikandar
**2.** Fêkîfiroş
**3.** Zebeşê ku Rodî dikire
**5.** Rodî

**a.** du kîlo tirî dadigire.
**b.** zebeşekî dixwaze.
**d.** 23 panot, 75 quriş dide dikandar.
**e.** pênc kîlo ye.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| b | | | | |

### 3- Hevokên li jêr sererast bikin.

**1-** bi / zebeşek / ye / çiqasî / ?
..........................................................................
**2-** tiriyê /kîloya / reş/ çend / bi / e / panotan / ?
..........................................................................
**3-** dendikên / nîv / gulan / digire / çiqas / kîlo / ?
..........................................................................
**4-** çar / kelem / panotan / libek / bi / e /.
..........................................................................
**5-** bexdenûs / bîst û pênc / baqek / e / qurişan / bi /.
..........................................................................
**6-** îsotan / bi / kîloya / e/ çendan / ?
..........................................................................

### 4- Cihên vala yên tabloya li jêr temam bikin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| 1 ..... | 11 yazdeh | 21 ............ | 10 deh | 121 Sed û bîst û yek |
| 2 du | 12 .......... | 22 bîst û du | 20 ............ | 200 ............. |
| 3 .... | 13 sêzdeh | 23 ............. | 30 sî | 300 sê sed |
| 4 çar | 14 ........... | 24 bîst û çar | 40 ............. | 400 ............... |
| 5 ....... | 15 pazdeh | 25 .............. | 50 pêncî | 500 pênc sed |
| 6 şeş | 16 ......... | 26 bîst û şeş | 60 ............ | 600 ............... |
| 7 ...... | 17 hevdeh | 27 ............. | 70 ......... | 700 heft sed |
| 8 heşt | 18 .......... | 28 bîst û heşt | 80 heştê | 800 heşt sed |
| 9 ...... | 19 nozdeh | 29 ............. | 90 nod | 900 ............... |
| 10 deh | 20 ......... | 30 sî | 100 ........ | 999 neh sed û nod neh |
| | | 31 .............. | 101 sed û yek | 1000 hezar |
| | | | 102 ........... | |

## C - Hîndariyên rêzimanî

### 1- Lêkerên li jêr bikin raweya fermanî.

| Lêker | Raweya fermanî (Yekjimar/pirjimar) |
|---|---|
| kirîn | bikire/ bikirin |
| firotin | |
| standin | |
| dan | |
| xwarin | |
| kelandin | |
| vekirin | veke/ vekin |
| çêkirin | |
| rabûn | |
| hilkişîn | |

### 2- Lêkerên di nava kevanekê de bikin raweya xwestekî.

**Mînak:** Ez dixwazim bilîzim.

**1.** Ez dixwazim şîr ............... (vexwarin)
**2.** Zozan ...... (xwestin) kîloyek hinar bikire.
**3.** Tu dixwazî çi .............. (anîn)?
**4.** Em dixwazin bi kurdî ............. (nivisîn)
**5.** Ew ............. (xwestin) binivin.
**6.** Hûn naxwazin ....................(hatin)?
**7.** Ez ................(na/ xwestin) te bibînim.


### 3- Di hevokên li jêr de cihên vala bi payeya hevrûkirinê dagirin.

1- Çiyayê Agirî ji Çiyayê Cûdî ...................... e. (bilind)
2- Gola Wanê ji Gola Hezarê ........................e. (mezin)
3- Serjimara Tirkiyeyê ji ya Yewnanîstanê ........................ e. (zêde)
4- Parzemîna Awistralyayê ji parzemîna Asyayê ................. e. (biçûk)
5- Riha ji Wanê ........................ e. (germ)
6- Li welatê me çiyayê ...................... Agirî ye. (bilind)
7- Gerestêrka ........................... Jupîter e. (mezin)
8- Li welatê me çemê .................. Çemê Feratê ye. (dirêj)
9- .................... sînemavanê kurd Yilmaz Guney e. (navdar)
10- Helbestvanê ............ yê kurmancî Elî Herîrî ye. (pêşîn)

# unîte 5 JIYAN

‣ serê sibê ‣ di rê de ‣ li dibistanê ‣ di fêrgehê de ‣ çûna sînemayê ‣ saet ‣ rêziman

## A- Serê sibê



| | |
|---|---|
| **Dayik** | Rojbaş keça min rabe, dereng e! |
| **Dîlan** | Rojbaş dayê! |
| **Dayik** | Here serçavên xwe bişo, taştê amade ye. |
| **Dîlan** | Baş e dayê, ez ê îro zû herim. |
| **Dayik** | Çima? |
| **Dîlan** | Ji ber ku ezmûna min heye. |
| **Dayik** | Nexwe lez bike keça min. Bavê te dê here dadgehê, dikare te jî bibe dibistanê. |
| **Dîlan** | Bila be dayê. |

## B- Di rê de



**Dîlan** Bavo tu yê îro biçî dadgehê?

**Rodî** Belê keça min, dozek heye, ez ê ji bo wê biçim.

**Dîlan** Dozeke çawa ye?

**Rodî** Muwekîlekî min ji ber sûcê diziyê ev çend meh in di girtîgehê de ye. Lê ez bawer dikim bêsûc e. Dozger cezayekî giran dixwaze. Lê piştî delîlên ku ez ê îro pêşkêş bikim, dê dadger biryara berdanê bide.

**Dîlan** Piştî wê tu yê çi bikî?

**Rodî** Ez ê biçim nivîsgehê û amadekariya doza sibê bikim. Piştî nîvro dê muwekîleke min were, em ê li ser doza wê bixebitin.

**Bersiva pirsên li jêr bidin.**

1. Rodî dê biçe ku derê?

   ........................................

2. Muwekîlê wî ji ber kîjan sûcî di girtîgehê de ye?

   ........................................

3. Kî cezayekî giran dixwaze?

   ........................................

4. Dê kî biryara dawîn bide?

   ........................................

5. Piştî dadgehê dê Rodî çi bike?

   ........................................

## C- Li dibistanê

### 1- Bernameya hefteyî

| ROJ | roja yekem | roja duyem | roja sêyem | roja çarem | roja pêncem | roja şeşem |
|---|---|---|---|---|---|---|
| DUŞEM | matematîk | matematîk | îngilizî | îngilizî | werzîş | werzîş |
| SÊŞEM | erdnîgarî | wêje | wêje | muzîk | ol û sinc | ol û sinc |
| ÇARŞEM | erdnîgarî | fizîk | kîmya | biyolojî | wêje | rêberî |
| PÊNCŞEM | wêje | matematîk | îngilizî | biyolojî | kompîtur | wêne |
| ÎN | fizîk | kîmya | fizîk | kompîtur | dîrok | dîrok |





**Rojda** Îro kîjan waneyên me hene?
**Dîlan** Îro pêncşem e. Waneyên matematîk, îngilîzî, kompîtur, wêje, biyolojî û wêneyê hene.
**Rojda** Alîkariya min bike, em sparteka min a waneya îngilîzî bi hev reçêkin.
**Dîlan** Xeman mexwe! Di navberê de em ê bi hev re çêkin.
**Rojda** Dereng e, em biçin fêrgehê!
**Dîlan** Fermo, em biçin.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Rojên pêncşeman kîjan waneyên Rojda û Dîlanê hene?
   ........................................
2. Di navberê de Rojda û Dîlan dê bi hev re çi bikin?
   ........................................

# 2- Di fêrgehê de



**Mamoste** Hevalino, em ê îro li ser pêşerojê biaxivin. Li gorî dîtina we piştî bîst salan dê çi guherîn çêbin?
**Dîlan** Mamoste ez dikarim bibêjim?
**Mamoste** Fermo Dîlan!
**Dîlan** Ez dibêjim, piştî bîst salan siware dê bi enerjiya rojê bixebitin.
**Mamoste** Nêrîneke balkêş e. Wekî din?
**Rojda** Ez dixwazim tiştekî bibêjim.
**Mamoste** Kerem bike.
**Rojda** Mirov dê di bin behrê de bajaran ava bikin.
**Mamoste** Dibe.
**Azad** Ramaneke min jî heye.
**Mamoste** Bibêje Bedran.
**Azad** Ez dibêjim, heta bîst salan dê qeşaya li cemseran tev bihele û dinya di bin avê de bimîne.
**Mamoste** Tu zêde bedbîn î Bedran. Ez bawer im, ev qas pêşbînî bes in.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Li gorî Dîlanê dê siware bi çi bixebitin?

   ..........................................

2. Bi nêrîna Rojdayê piştî bîst salan dê çi bibe?

   ..........................................

3. Li gorî pêşbîniya Azad heta bîst salan dê çi biqewime?

   ..........................................

4. Li gorî mamoste pêşbîniya Azad pêşbîniyeke çawa ye?

   ..........................................

5. Li gorî we heta bîst salan dê çi guherîn çêbin?

   ..........................................

## D- Çûna sînemayê

### 1- Li ser pirsên li jêr bipeyivin.

1- Hûn diçin sînemayê?
2- Hûn ji kîjan lîstikvanan hez dikin?

| | |
|---|---|
| **Dîlan** | Rojên pêncşeman fîlmên nû tên sînemayê. |
| **Azad** | Îro pêncşem e, em biçin sînemayê? |
| **Hêlîn** | Gelo îro kîjan fîlm dilîze? |
| **Diyar** | Di Sînemaya Metropolê de fîlmê "Bahoz" dilîze. |
| **Dîlan** | Ez ji mêj ve li bendê me. Em ê biçin. |
| **Diyar** | Îro piştî nîvro dibe. Lê, em ê pêşî malbata xwe agahdar bikin. |
| **Dîlan** | Em ê nîvro biçin malê û paşê biçin sînemayê. |
| **Hêlîn** | Ez ê jî ji diya xwe destûrê bistînim û bêm. |
| **Diyar** | Kesekî din ku em ê jê re bibêjin heye? |
| **Dîlan** | Rojda jî bê, dê baştir bibe. |
| **Diyar** | Ez ê ji wê re jî bibêjim. |
| **Dîlan** | Ji bîr mekin, saet du û nîvan de em ê hev li ber sînemayê bibînin. |



### 2- Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.

**1.** Di kîjan rojê de fîlmên nû tên sînemayê?
......................................................
**2.** Di sînemeya Metropolê de dê kîjan fîlm bilîze?
......................................................
**3.** Kî li benda fîlmê "Bahoz" e?
......................................................
**4.** Hêlîn dê destûre ji kê bistîne?
......................................................
**5.** Dîlan û hevalên xwe kengî dê biçin sînemayê?
......................................................
**6.** Heval dê li ku bicivin?
......................................................



## E- Saet



dibore — heye — nîv — çaryek dibore — çaryek heye

## Saet çend e?



Saet sê ye. | saet çar çaryek e. | Saet ji çaran deh dibore. / Çar û deh deqe. | Saet çar û nîv e. | Saet ji şeşan re çaryek heye./ şeş kêm çaryek



Saet ji heştan pênc dibore./ Heşt û pênc deqe. | Saet ji heftan re deh heye./ Heft kêm deh deqe. | Saet ji heştan re bîst û pênc heye. | Saet ji dehan bîst dibore./ Heşt û bîst deqe. | Saet dozdeh e.

| | | |
|---|---|---|
| 7:05 : ............................ | 9:10: ............................ | 10:30:............................ |
| 7:08 : ............................ | 9:15: ............................ | 10:34:............................ |
| 8:09 : ............................ | 9:25: ............................ | 10:40:............................ |

## F- Rêziman

# Dema Bê

| lêker | daçeka dema bê | qertafa fermanî | rayeka dema niha | qertafa kesane | hevok (erênî) | hevok (neyînî) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| xwarin | dê /ê | bi | xw | im | Ez dê/ê bixwim. | Ez dê/ê nexwim. |
| çûn | | | ç | | Ez dê/ê biçim. | Ez dê/ê neçim. |
| birin | | | bir | | Ez dê/ê bibim. | Ez dê/ê nebim. |
| kirin | | | k | | Ez dê/ê bikim. | Ez dê/ê nekim. |
| ketin | | | kev | | Ez dê/ê bikeve. | Ez dê/ê nekevim. |
| xwestin | | | xwaz | | Ez dê/ê bixwazim. | Ez dê/ê nexwazim. |
| vekirin | | | ve-k | | Ez dê/ê vekim. | Ez dê/ê venekim. |
| raxistin | | | ra-x | | Ez dê/ê raxim. | Ez dê/ê ranexim. |
| vexwarin | | | ve-xw | | Ez dê/ê vexwim. | Ez dê/ê venexwim. |

**lêkerên pêkhatî**

| lêker | daçeka dema bê | rayeka dema niha | qertafa kesane | hevok (erênî) | hevok (neyînî) |
|---|---|---|---|---|---|
| vexwarin | dê /ê | ve-xw | im | Ez dê/ê vexwim. | Ez dê/ê venexwim. |
| vekirin | | ve-k | | Ez dê/ê vekim. | Ez dê/ê venekim. |
| raxistin | | ra-x | | Ez dê/ê raxim. | Ez dê/ê ranexim. |
| wergirtin | | wer-gir | | Ez dê/ê wergirim. | Ez dê/ê wernegirim. |
| hilkişîn | | hil-kiş | | Ez dê/ê hilkişim. | Ez dê/ê hilnekişim. |
| daxistin | | da-x | | Ez dê/ê daxim. | Ez dê/ê danexim. |
| hildan | | hil-d | | Ez dê/ê hildim. | Ez dê/ê hilnedim. |
| rûniştin | | rû-niş | | Ez dê/ê rûnim. | Ez dê/ê rûnenim. |
| rabûn | | ra-b | | Ez dê/ê rabim. | Ez dê/ê ranebim. |


**lêkerên nerêzikî**

| lêker | daçeka dema bê | qertefa fermanî | rayeka dema niha | qertafa kesane | hevok (erênî) | hevok (neyînî) |
|---|---|---|---|---|---|---|
| gotin | dê /ê | bi | bêj | im | Ez dê/ê bêjim. | Ez dê/ê nebêjim. |
| dîtin | | | bîn | | Ez dê/ê bibînim. | Ez dê/ê nebînim. |
| anîn | | | în | | Ez dê/ê bînim. | Ez dê/ê neynim. |
| hiştin | | | hêl | | Ez dê/ê bihêlim. | Ez dê/ê nehêlim. |
| pehtin | | | pêj | | Ez dê/ê bipêjim. | Ez dê/ê nepêjim. |
| hatin | | | wer | | Ez dê/ê werim. | Ez dê/ê neyêm. |
| çûn | | | her | | Ez dê/ê herim. | Ez dê/ê nerim. |

## A - Xebata li ser peyvan

**1- Ji van peyvan ên ku bi dibistanê re têkildar di nav xelekan de binivîsin.**

| | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|
| fêrgeh | jêhatî | nivîn | wane | depreş | navîn | rastkêş |
| erdnîgarî | ezmûn | rûniştgeh | serkeftin | nîv | nexşe | |
| çaryek | pol | spor | gog | jêbir | qelemtraş | |



## B- Bikaranîna zimên

### 1- Cihên vala dagirin.

**Berçem** Bêrîvan, vê havînê tu yê çi .............. (kirin) ?
**Bêrîvan** Ez ê tevî malbata xwe ............ (çûn) ber Behra Wanê.
**Berçem** Hûn ê li ku derê .............. (mayîn)?
**Bêrîvan** Hevalekî bavê min li Tetwanê heye, em ê li wir ............ (mayîn).
**Berçem** Hûn ê li wir dema xwe çawa derbas ................ (kirin).
**Bêrîvan** Em ê ........... (ketin) avê, em ê .......... (çûn) ser Kela Wanê, em ê li nava bajêr ............... (gerîn), em ê bi keştiyê ........... (çûn) Dêra Axtamarayê.
**Berçem** Xweziya min bi dilê te. Ez ê vê havînê ............. (xebitîn).

### 2- Li gorî agahiyên li jor paragrafekê binivîsin.

*Bêrîvan dê vê havînê bi malbata xwe re biçe ber Behra Wanê.* ........................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................

### 3- Li gorî pirsên li jêr paragrafekê li ser betlaneya xwe ya havîna bê binivîsînin.

**1-** *Hûn ê biçin ku derê?*
**2-** *Hûn ê li ku derê bimînin?*
**3-** *Hûn ê li wir çi bikin?*
..........................................................................................................
..........................................................................................................
..........................................................................................................

**4- Saetên ku bi hejmaran hatine nivîsîn bi nivîsê binivîsin.**

**Mînak:**

**4:03** Ji çaran sê dibore.
**4:15** Çar û çaryek e.
**4:30** Çar û nîv.
**3:40** Ji çaran re bîst heye.
**3:45** Çar kêm çaryek.

3:08 ..........................................

2:34 ..........................................

2:10 ..........................................

3:50 ..........................................

8:15 ..........................................

1:45 ..........................................

6:22 ..........................................

12:53 ..........................................

7:25 ..........................................

11:19 ..........................................

10:30 ..........................................

9:59 ..........................................

## 5- Tu yê sibê çi bikî?

**Xunav** Bêrîvan, sibê tu yê çi bikî?
**Bêrîvan** Tu karê min nîn e. Lewma ez ê dereng rabim.
**Xunav** Em bi hev re ji bo sibê planekê çêkin?
**Bêrîvan** Belê dibe, em ê çi bikin?
**Xunav** Em ê biçin sînemayê.
**Bêrîvan** Em ê biçin kîjan fîlmî?
**Xunav** Fîlmê "Bahoz" heye.
**Bêrîvan** Baş e. Em ê kengî û li ku hev û du bibînin?
**Xunav** Em ê di saet dozdehan de li ber sînemayê hev û du bibînin.
**Bêrîvan** Dibe, ez ê sibê li wir li benda te bim.

**Ji hevokên li jêr ên rast bin, bi (r) yên çewt bin, bi (ç) xêz bikin**

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Bêrîvan ê sibê zû rabe. | | ✓ |
| 2 | Ew ê sibê biçin sînemayê. | | |
| 3 | Ew ê biçin fîlmê "Kûsî jî difirin". | | |
| 4 | Ew ê li ber sînemayê hev û du bibînin. | | |
| 5 | Ew ê saet dozdehan de hev û du bibînin. | | |

# unîte 6 HOBÎ

- şano
- muzîk
- werzîş
- karîn
- pirtûkxane
- geşt û seyran
- rêziman

## A- Çûna şanoyê



**Azad** Îro dibistana me zû qediya. Sibe jî betlane ye.
**Diyar** Heta êvarê çar saet dema me heye. Em çi bikin?
**Hêlîn** Em biçin şanoyê?
**Diyar** Di şanoyê de kîjan lîstik dilîze?
**Rojda** Hefteya borî " Mişko " dilîst. Dibe ku vê hefteyê jî berdewam bike.
**Azad** Em dikarin bi telefonê bernameyê fêr bibin?
**Dîlan** Ez hejmara telefona wan dizanim. Ez ê fêr bibim. (...) Hevalno, lîstika " Mişko " berdewam dike. Lê bila yek ji me heta saetekê bilêtan bikire.
**Azad** Ez ê biçim, kî tê şanoyê bila heqê bilêta xwe bide!
**Hêlîn** Divê ez herim malê. Diya min li benda min e.
**Rojda** Lîstik kengê dest pê dike ?
**Dîlan** Bi tenê di danîşana saet pêncan de cih hebû.
**Azad** Em di saet çar û nîvan de li ber deriyê şanoyê hev û du bibînin.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Îro çiqas dema wan heye?
   ..................................................
2. Ew bernameya şanoyê çawa hîndibin?
   ..................................................
3. Kî hejmara telefona şanoyê dizane?
   ..................................................
4. Di şanoyê de kîjan lîstik dilîze?
   ..................................................
5. Lîstîk kengê dest pê dike?
   ..................................................
6. Kî diçe bilêtan dikire ?
   ..................................................

## B. Guhdariya Muzîkê

### 1- Li ser pirsên li jêr bipeyivin.

**1-** Hûn ji kîjan cureyê muzîkê hez dikin?
**2-** Dengê kîjan amûrê mûzîkê bi we xweş tê?
**3-** Kêfa we ji kîjan hunermendî re tê?

### 2- Van peyvan binasin

**stran amûr deng dengê zîz**
**dengê dilsoj zêmar dengbêj**
**stranbêj dûrik huner stirîn**
**hunermend**

### 3- Cihên vala bi peyvên li jor dagirin.

Dûrik, stranbêj, dilsoj, dengbêj, amûr, stran

**1-** Bilûr ........... muzîkê ye.
**2-** Meyremxan ............. navdar a kurd e.
**3-** ............ Lawikê Metînî pir xweş e.
**4-** Karapêtê Xaço ............ e.
**5-** Zêmar stranên ......... in.
**6-** Navê stranên dawetan ............ e.

## 4- Stranek

**Zimanê Kurdî**

Bi xeml û rewş e
Şirîn û xweş e
Şirîn û xweş e
Zimanê kurdî

Bi xweş awaz e
Letîf û naz e
Letîf û naz e
Zimanê kurdî

Beyta Feqî ye
Kubra Xanî ye
Kubra Xanî ye
Zimanê kurdî

Bi xeml û rewş e
Şirîn û xweş e
Şirîn û xweş e
Zimanê kurdî

Qewqeba çiya ne
Kubra Teyran e
Kubra Teyran e
Zimanê kurdî

*Stranbêj: Aramê Dîkran*





## 5- Tu ji muzîkê hez dikî?

| | |
|---|---|
| **Azad** | Tu ji muzîkê hez dikî? |
| **Diyar** | Erê, ez gelekî ji muzîkê hez dikim. |
| **Azad** | Kêfa te ji kîjan cureyê muzîkê re tê? |
| **Diyar** | Ez ji stranên dengbêjiyê pir hez dikim. Lê tu? |
| **Azad** | Ez ji stranên govendê hez dikim. |
| **Diyar** | Ez jî ji stranên govendê hez dikim. |
| **Azad** | Tu ji kîjan hunermendî hez dikî? |
| **Diyar** | Herî zêde ez ji Karapetê Xaço hez dikim. Tu ji kê hez dikî? |
| **Azad** | Ez ji dengê Muradê Kinê pir hez dikim. |
| **Diyar** | Kîjan kilam zêde li xweşiya te diçin? |
| **Azad** | Kilama "Çemê Çetelê" û "Lawikê Metînî ". |


**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Diyar ji kîjan cureyê muzîkê hez dike?
   ...............................................
2. Kêfa Azad ji kîjan muzîkê re tê?
   ...............................................
3. Diyar herî zêde ji kîjan hunermendî hez dike?
   ...............................................
4. Kî ji dengê Muradê Kinê hez dike?
   ...............................................
5. Kî ji kilama "Lawikê Metînî" hez dike?
   ...............................................

## C- Werzîş

**1- Pirsên li jêr nîqaş bikin.**

*1) Hûn ji kîjan cureyên werzîşê hez dikin?*
*2) Kêfa we ji futbolê re tê?*
*3) Hûn ji kîjan lîstikvanên futbolê hez dikin?*
*4) Hûn qet diçin kaşûnê?*






















## 2- Tu ji werzîşê hez dikî?

**Azad** Ez ji werzîşê pir hez dikim.
**Diyar** Ez jî ji werzîşê pir hez dikim, nemaze jî ji avjeniyê.
**Azad** Ez jî goga piyan pir hez dikim.
**Diyar** Her wiha ez her roj serê sibê saetekê jî li parkê dimeşim.
**Azad** Meş ji bo tenduristiya mirov pir baş e. Ez her hefte bi hevalên xwe re goga piyan dilîzim.
**Diyar** Hûn kîjan rojê dilîzin?
**Azad** Roja çarşemiyê.
**Diyar** Ez jî dixwazim beşdarî we bibim.
**Azad** Kerem bike, em vê hefteyê bi hev re biçin.
**Diyar** Baş e, em ê hev bibînin.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Kî ji avjeniyê hez dike?
   ..........................................
2. Azad ji çi hez dike?
   ..........................................
3. Diyar li ku dimeşe?
   ..........................................
4. Meş ji bo çi baş e?
   ..........................................
5. Azad tevî hevalên xwe kîjan rojê goga piyan dilîze?
   ..........................................

## D- Rêziman

| Cînavkên kesane | Lêkera alîkar | Lêkera bingehîn |
|---|---|---|
| Ez | dikarim/nikarim | bibezim |
| Tu | dikarî /nikarî | bibezî |
| Ew | dikare/nikare | bibeze |
| Em | dikarin/nikarin | bibezin |
| Hûn | dikarin/nikarin | bibezin |
| Ew | dikarin/nikarin | bibezin |

### 1- Ji karên li jêr ên ku hûn dikarin û yên ku hûn nikarin diyar bikin.

**Mînak:** Ez dikarim / nikarim bi kurdî biaxivim.

**1.** Ez dikarim / nikarim li bilûrê bidim.
**2.** Ez dikarim / nikarim kompîturê bi kar bînim.
**3.** Ez dikarim / nikarim bi îngilîzî bipeyivim.
**4.** Ez dikarim / nikarim wêneyan xêz bikim.
**5.** Ez dikarim / nikarim govendê bigirim.
**6.** Ez dikarim / nikarim stranan bibêjim.
**7.** Ez dikarim / nikarim helbestan binivîsim.
**8.** Ez dikarim / nikarim avjeniyê bikim.

### 2- Lêkera karînê li gorî cînavkan bikişînin.

**Mînak:** Ez *dikarim* bi kurdî biaxivim.

**1.** Tu ................li gîtarê bidî?
**2.** Hûn ............... kompîturê bi kar bînin. (neyînî)
**3.** Ew ............... bi tirkî bipeyivin.
**4.** Em ............... stranan bibêjin.
**5.** Ez ...............helbestan binivîsim. (neyînî)

### 3- Lêkera bingehîn li gorî cînavkan bikişînin.

**Mînak:** Ew dikare bi kurdî *binivîse*.

**1.** Ew dikare govendê ...............? (girtin)
**2.** Em nikarin wêneyan xêz ................ (kirin)
**3.** Tu dikarî xwarinê ............... ? (çêkirin)
**4.** Hûn dikarin erebeyê............... (ajotin)
**5.** Ez nikarim gulan ................ (çandin)

## E- Ez dikarim avjeniyê bikim.

**Rojda** Hêlîn, tu dikarî avjeniyê bikî?
**Hêlîn** Belê, ez dikarim. Ez di avjeniyê de gelek jêhatî me.
**Rojda** Pir baş e. Mixabin ez nikarim baş avjeniyê bikim. Lê ez dikarim basketbolê bilîzim.
**Hêlîn** Belê, ez jî ji basketbolê hez dikim, lê ez pir ne jêhatî me. Ez di muzîkê de gelek pêşketî me. Ez dikarim tembûr û bilûrê lê bidim.
**Rojda** Ez jî ji muzîkê hez dikim. Lê ez nikarim amûreke muzîkê lê bidim. Ez tenê dikarim stranan bibêjim.
**Hêlîn** Ez dikarim te hînî lêdana bilûrê bikim.
**Rojda** Ez ê gelekî kêfxweş bibim.



**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

**1.** Kî dikare avjeniyê bike ?
..................................................
**2.** Rojda dikare çi bilîze?
..................................................
**3.** Hêlîn dikare kîjan amûrên muzîkê lê bide?
..................................................
**4.** Kî dikare stranan bibêje?
..................................................
**5.** Hêlîn dixwaze Rojdayê hînî çi bike?
..................................................




## F- Azad çû pirtûkxaneyê

### 1- Pirsên li jêr bibersivînin.

*1) Hûn ji xwendinê hez dikin?*
*2) Hûn kîjan nivîskarên kurd dinasin?*

Ez duh çûm pirtûkxaneyê. Min du pirtûkên çîrokan wergirtin. Ez ê wan bixwînim. Meha çûyî jî min sê pirtûk xwendin. Pirtûkek bi navê "Çîrokên Gelêrî" hebû. Gelekî kêfa min ji wê re hat. Di wê pirtûkê de der barê Ristemê Zal de çîrokek hebû. Ew çîrok pir balkêş bû. Di vê çîrokê de lehengiya Ristemê Zal pir kêfa min anî. Mirov bi çîrokên wiha dilşad dibe. Wekî din jî gelek çîrokên xweş di vê pirtûkê de hebûn.

### 2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

**1.** Azad duh çû ku derê?

..............................................

**2.** Wî çend pirtûk wergirtin?

..............................................

**3.** Wî meha çûyî çend pirtûk xwendin?

..............................................

**4.** Kêfa wî ji kîjan pirtûkê re hat?

..............................................

**5.** Kêfa wî ji kîjan çîrokê re hat?

..............................................

## G- Geşt û seyran



**Çiya** Rojbaş Dilhat, tu duh li ku derê bûyî?

**Dilhat** Rojbaş hevalê Çiya, ez duh tevî hevalên xwe çûm ser Kela Wanê.

**Çiya** Te çima gazî min nekir?

**Dilhat** Min telefonî malê kir, lê tu ne li malê bûyî.

**Çiya** Xem nake, geşta we çawa derbas bû?

**Dilhat** Gelekî xweş bû. Em serê sibê zû rabûn. Em bi erebeya Reşo çûn.

**Çiya** Reşo jî hat?

**Dilhat** Belê, ez, Reşo, Gulê, Demhat û Fatê bi hev re çûn. Em zû gihîştin wê derê. Me ji xwe re cihekî xweş dît û em lê rûniştin. Me taştêya xwe xwar. Dûre, em hilkişiyan ser kelê. Ji ser kelê bajarê Wanê pir xweş xuya dike. Li wir hin zarok hebûn. Wan ji me re qala dîroka Kela Wanê kir. Me gelek wêne kişandin. Paşê em daketin jêr, me firavîn xwar.

**Çiya** Noşîcan be, we çi xwar?

**Dilhat** Me bi xwe re masî birin û li ser manqelê biraştin.

**Çiya** We paşê çi kir?

**Dilhat** Paşê jî Demhat li tembûrê da û me li ber govend girt. Roja me pir xweş derbas bû.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Dilhat û hevalên xwe çûn ku derê?
.........................................

2. Ew bi çi çûn?
.........................................

3. Wan piştî taştê çi kir?
.........................................

4. Kê ji wan re qala dîroka Kela Wanê kir?
.........................................

5. Ji ser kelê dîmenê bajêr çawa bû?
.........................................

6. Di firavînê de wan çi xwar?
.........................................

7. Wan li ber çi govend girt?
.........................................

## H- Rêziman

# Dema boriya têdeyî

### Li gorî lêkerên negerguhêz

| lêker | rayeka dema borî | kirde | pêveber |
|---|---|---|---|
| çûn | çû | Ez | çûm. |
| | | Tu | çûyî. |
| | | Ew | çû. |
| | | Em | çûn. |
| | | Hûn | çûn. |
| | | Ew | çûn. |

Ez ji dibistanê hatim.
Tu ji ser banî ketî.
Deriyê malê vebû.

Karker ji kargehê derketin.
Em li ber behrê rûniştin.
Hûn bi mamoste re peyivîn?

### Li gorî lêkerên gerguhêz

| lêker | rayeka d. borî | kirde | bireser | pêveber |
|---|---|---|---|---|
| xwarin | xwar | Min | sêvek sêv | xwar |
| | | Te | | |
| | | Wî/Wê | | |
| | | Me | | |
| | | We | | |
| | | Wan | | |

| lêker | rayeka d. borî | kirde | bireser | pêveber |
|---|---|---|---|---|
| xwarin | xwar | Min | du sêv sêv | xwarin |
| | | Te | | |
| | | Wî/Wê | | |
| | | Me | | |
| | | We | | |
| | | Wan | | |

### Li gorî bireser kişandina lêkerên gerguhêz

| lêker | kirde | bireser | pêveber |
|---|---|---|---|
| dîtin | Te | ez | dîtim. |
| | Min | tu | dîtî. |
| | Wan | ew | dît. |
| | Wê | em | dîtin. |
| | Me | hûn | dîtin. |
| | Wî | ew | dîtin. |

Min bernameyê temaşe kir.
Wî ji malê pirtûkek anî.
Me li mala wan firavîn xwar.

Te ez li ber dêrî hiştim.
Wê tu li gund dîtî.
Wan karekî baş kir.

# A - Xebata li ser peyvan

## 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| şano | werzîş | avjenî | hunermend | stran |
| çîrok | ***govend*** | tendirustî | lîstik | |

**Mînak** Ez ji ***govendê*** hez dikim.

**Dîlan** Tu ji kîjan ..................... hez dikî?
**Bengî** Ez ji Mihemed Şêxo hez dikim.
**Dîlan** Tu ji kîjan ..................... wî hez dikî?
**Bengî** Ez ji strana "Ay lê Gulê" hez dikim.

**Serhat** Tu ji ..................... hez dikî?
**Tevger** Belê, bi taybetî jî ji goga piyan hez dikim.
**Serhat** Tu dikarî ......................... jî bikî?
**Tevger** Mixabin, ez nikarim xwe li ser avê ragirim.
**Serhat** Lê avjenî ji bo ......................... pir baş e.

**Zelal** Tu qet diçî .............................?
**Aram** Belê, min duh li .......................... Şanoya Hêvî temaşe kir.
**Zelal** Navê lîstikê çi bû?
**Aram** "Derwêşê Evdî". Navê xwe ji .................. Derwêşê Evdî û Edûlê digire.

## 2- Nêçîra peyvan

1. *HELBEST*........................
2. ......................................
3. ......................................
4. ......................................
5. ......................................
6. ......................................
7. ......................................
8. ......................................

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| E | D | R | **H** | **E** | **L** | **B** | **E** | **S** | **T** | E |
| H | E | G | E | T | H | I | L | H | A | M |
| E | N | E | T | I | A | V | J | E | N | B |
| N | G | Ş | L | V | V | G | H | L | T | Û |
| G | B | T | T | A | Î | E | R | T | Y | R |
| E | Ê | G | N | Z | N | Q | W | X | R | K |
| Q | J | H | E | E | E | R | Ş | A | N | O |
| A | R | J | G | Y | G | G | T | T | T | L |
| P | A | Ş | K | A | Z | A | M | Î | M | Ê |
| D | T | J | R | M | T | Y | Q | W | E | S |
| W | E | R | Z | Î | Ş | B | I | L | Û | R |

# B- Xwendin

### 1- Dîlan çû seyranê

Pêr, em bi malbatî çûn geşt û seyranê. Em ne bi tenê bûn, mala xaltîka min jî bi erebeya xwe hatin. Em çûn ber Çemê Dîcleyê, geşta me gelekî xweş bû. Hewa pir xweş bû. Em serê sibê zû ji mal derketin û bi erebeyê çûn. Ji ber vê yekê jî me cihekî xweş bi dest xist. Hîn zêde kes nehatibû.

Cihê ku em lê rûniştin, cihekî bi dar û ber bû û nêzîkî avê bû. Li wê derê kaniyek hebû, ava wê pir cemidî bû. Me tiştên xwe ji erebeyê danîn, me berikek xwe raxist, mînderên xwe jî danîn serê û em li ser rûniştin. Bavê min ji me re hêlekanek jî çêkir. Bi me re top jî hebû.

Hinekan ji me dest bi amadekirina taştê kir. Hinek jî bi vêxistina êgir re eleqedar bûn. Heçî em zarok bûn, kesî ji me tu kar nexwest. Heta ku xwarin amade bû, em li derdorê geriyan. Piştî demeke kurt taştê amade bû. Me taştêya xwe xwar. Piştre me hemûyan bi hev re bi topê lîst. Paşê xaltîka min û hevserê wê goşt amade kir, bavê min û diya min jî manqel vêxist. Goşt danîn ser manqelê û me di firavînê de goşt xwar. Me dîsa bi topê lîst û em li hêlakanê siwar bûn. Sîdar û Tacdîn ketin avê. Hevserê xaltîka min Apê Hogir nîk bi xwe re anîbû. Piştî nîvro wî û bavê min li ber çêm masî girtin û li ser manqelê masî pijandin û me jî goştê masiyan xwar. Çêja goştê masiyan pir xweş bû. Em serêvarkî vegeriyan malê. Rojeke pir xweş bû. Lê em pir westiyan, lewre jî em zû raketin.

### a- Bersiva van pirsên li jêr bide.

**1-**Ew kengî çûn geştê û seyranê?
......................................................

**2-**Ew çûn ku derê?
......................................................

**3-**Ew li cihekî çawa rûniştin?
......................................................

**4-**Zarokan heta xwarinê çi kir?
......................................................

**5-**Kê ji zarokan re hêlekan çêkir?
......................................................

**6-**Wan di firavînê de çi xwar?
......................................................

**7-** Piştî firavînê Sîdar û Tacdîn çi kir?
......................................................

**8-** Kê masî girtin?
......................................................

**9-** Ew kengî vegeriyan malê?
......................................................

**10-** Ew çima zû raketin?
......................................................

### b) Beşên hevokên ku hev temam dikin bigihînin hev.

**1.** Wan cihekî baş bi dest xist,
**2.** Zarok li derdorê geriyan,
**3.** Cihê wan xweş bû,
**4.** Ew zû raketin,
**5.** Zarok li hêlekanê siwar bûn,

**a.** ji ber ku ew pir westiyabûn.
**b.** ji ber ku cihekî bi dar û ber û nêzîkî avê bû.
**c.** ji ber ku bavê wan ji wan re hêlekan çêkir.
**d.** ji ber ku ew serê sibê zû çûn.
**e.** ji ber ku kesî ji wan tu kar nexwest.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 |
|---|---|---|---|---|
| d | | | | |

### 2- Rojan çû mûzexaneyê

Ez roja yekşemê çûm mûzexaneyê. Bavê min ez birim muzexaneya bajêr. Me di mûzexaneyê de tiştên gelekî balkêş dîtin. Li mûzexaneyê pêşangeha tiştên kevn û dîrokî hebû. Di pêşangehê de tiştên mîna qafik, tasik, destar, derzî, tevşo hebûn. Tiştê ku herî zêde bala min kişand, xemlên jinan bûn. Xişirên zîvîn û zêrîn gelekî xweşik bûn.
Gerînendeyê mûzexaneyê ji me re qala şaristanî û serdemên berê kir. Di mûzexaneyê de hinek kevir hebûn, li ser wan jî hinek nivîsên cihêreng hebûn. Me tu tişt ji wan nivîsan fêm nekir. Bavê min got, "Ev nivîsên bizmarî ne." Li ber her nivîsê jî wateya wê hebû. Ez bi vê serdanê hînî pir tiştan bûm.

### Bersiva van pirsên li jêr bide.

**1-** Rojan roja yekşemiyê çû ku derê?
......................................................

**2-** Kê ew bir mûzexaneyê?
......................................................

**3-** Li mûzexaneyê pêşangeha çi hebû?
......................................................

**4-** Herî zêde çi bala wî kişand?
......................................................

**5-** Kê qala şaristanî û serdemên berê kir?
......................................................

6- Li mûzexaneyê nivîsên çawa hebûn?
......................................................

## C - Hîndariyên rêzimanî

### 1- Di hevokên li jêr de lêkeran li gorî dema boriya têdeyî bikişînin.

**Mînak** Rojan roja yekşemê **çû** (çûn) mûzexaneyê.

**1-** Dîlanê destê xwe bilind ........ (kirin).
**2-** Rêzan kinc .................. (şûştin).
**3-** Seyran ji Amedê zû........... (vegerîn).
**4-** Xalê min par ez ...... (birin) Heskîfê.
**5-** Min hevalên te ............. (naskirin).
**6-** Wî pêr milê xwe ........... (şikandin).
**7-** Min kevirek .......... (avêtin) nava avê.
**8-** Qenco dereng ji xew ............ (rabûn).
**9-** Ez îro zû ................... (gihîştin) malê.
**10-** Wan xwarin.................... (pehtin).

### 2- Bi van peyvan li gorî forma karînê hevokan saz bikin.

**Mînak**


Ew / govend / girtin.
Ew dikare govendê bigire. (erênî)/ Ew nikare govendê bigire.(neyînî)

**1-** Ez / avjenî / kirin(neyînî)................................................
**2-** Tu / goga piyan / lîstin ..................................................
**3-** Em / bi / îngilîzî / axivîn ..................................................
**4-** Dîlan / wêne / çêkirin (neyînî) ............................................
**5-** Hûn / stran / gotin .........................................................
**6-** Sîdar / tembûr / lêdan.....................................................
**7-** Sînem / helbest / nivîsîn (neyînî) ....................................
**8-** Ez / xwarin / çêkirin .....................................................

# unîte 7 CIH Û WAR

• cîhan • bajar • taxa me • avahiya me • odeya Hêlînê • rêziman

## A- Cîhan




## Kî dizane?

**1. Berlîn paytexta kîjan welatî ye ?**
**a)** Fransa **b)** Portekîz **c)** Almanya **d)** Japonya

**2. Navê paytexta Îngilistanê çi ye?**
**a)** Parîs **b)** London c) Tîran **d)** Bûdapêşte

**3. Gelê Kûbayê bi çi zimanê dipeyivin ?**
**a)** erebî **b)** fransî **c)** farisî **d)** îspanî

**4. Îtalya li ser kîjan parzemînê ye?**
**a)** Afrîka **b)** Amerîka **c)** Antartîka **d)** Ewropa

**5. Kurdistan li ser kîjan parzemînê ye?**
**a)** Afrîka **b)** Asya **c)** Amerîka **d)** Ewropa

**6. Li kîjan welatî bi farisî diaxivin?**
**a)** Pakîstan **b)** Tirkiye **c)** Îran **d)** Sûriye




| WELAT | NETEWE | ZIMAN |
|---|---|---|
| Tirkiye | tirk | tirkî |
| Almanya | alman | almanî |
| Îran | faris | farisî |
| Amerîka | amerîkî | îngilîzî |
| Japonya | japon | japonî |
| Kûba | kûbayî | îspanî |
| Kurdistan | kurd | kurdî |
| Iraq | ereb | erebî |

## B- Bajar

# 1-Hevpeyvîn

### 1- Pirsên li jêr bibersivînin.

*1) Serjimara bajarê we çiqas e?*
*2) Bajarê we bi çi tiştê xwe navdar e?*
*3) Li bajarê we kîjan çiya û çem hene?*



**Nûçegihan** Rojbaş, ez dikarim hevpeyvîneke bi te re bikim?

**Diyar** Belê, kerem bike.

**Nûçegihan** Tu ji ku derê yî?

**Diyar** Ez ji Agiriyê me.

**Nûçegihan** Tu dikarî ji me re qala Agiriyê bikî?

**Diyar** Agirî bajarekî dîrokî û mezin e. Agirî navê xwe ji Çiyayê Agirî digire. Çiyayê Agirî di nava tixûbê vî bajarî de ye.

**Nûçegihan** Hejmara şêniyê bajêr çiqas e?

**Diyar** Hejmara şêniyê navenda bajêr nêzikî sed hezar kesî ye. Hejmara hemû şêniyên bajêr bi navçe, bajarok û gundên xwe ve ji pênc sed hezarî zêdetir e.

**Nûçegihan** Çemê Muradê di Agiriyê re derbas dibe, ne wisa?

**Diyar** Erê, çemê Muradê di kêleka bajêr re diherike.

**Nûçegihan** Wekî din çi cih û warên taybet hene?

**Diyar** Li rojhilatê bajêr Bazîda rengîn cih digire. Li vê navçeyê Qesra Îsheq Paşa û gora Ehmedê Xanî hene. Her roj bi dehan kes tên serdana qesrê û gora Ehmedê Xanî ziyaret dikin.

**Nûçegihan** Ji bo alîkariya te zor spas.

**Diyar** Spasxweş.

### Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

1- Agirî bajarekî çawa ye?

..................................................

2- Bajar navê xwe ji ku digire?

..................................................

3- Hejmara şêniyê navenda bajêr çi qas e?

..................................................

4- Kîjan çem di nav Agiriyê re derbas dibe?

..................................................

5- Li Bazîdê kîjan qesra navdar heye?

..................................................

6- Gora Ehmedê Xanî li ku ye?

..................................................

## C- Taxa me

### QADA ÎSTASYONA TRÊNÊ

Îstasyona trênê di navenda Amedê de, li derveyî sûran e. Kolana Mêrg Ehmed, ji navenda sûran dest pê dike û li ber Deriyê Rihayê diqede. Dûmahîka vê kolanê Kolana Îstasyonê ye. Ev kolan ji Deriyê Rihayê dest pê dike û ber bi îstasyonê ve didome. Kolan li Qada Îstasyonê bi dawî dibe. Li ser destê rastê ya Kolana Îstasyonê stadyûma bajêr heye.

Qada Îstasyonê cihekî pir fireh e. Li hemberî îstasyonê Parka Sûmerê heye. Ev parka mezin qadê xweş û geş dike. Li tenişta qadê mizgeftek heye. Hin pîrozbahiyên girseyî û mitîng li vê qadê pêk tên.

**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1. Îstasyona trênê li ku derê ye?

   ..................................................

2. Kolana Mêrg Ehmed ji ku derê dest pê dike?

   ..................................................

3. Kolana Îstasyonê ji ku derê dest pê dike?

   ..................................................

4. Kolana Îstasyonê li ku bi dawî dibe?

   ..................................................

5. Parka Sumerê li kîjan hêlê ye?

   ..................................................



## D- Avahiya me



**Hevala hêja Sorgul,**

Nameya te duh gihîşt ber destên min. Ji bo nameyê pir spas dikim. Li ser xwesteka te ez ê ji te re behsa mala me bikim.

Mala me di avahiyeke mezin û bilind de ye. Avahî yazdeh tebeqe ye. Di her tebeqeyê de çar mal hene. Di her malekê de sê ode, eywaneke mezin, mitbex, daşir, serşok û holek hene. Her wiha şaneşîneke fireh û mezin jî heye.

Derûdora avahiya me vekirî ye. Em dikarin di şaneşînê de li hawirdorê baş temaşe bikin. Dîmenên xweşik li ber çavên me ne. Di avahiya me de du asansor hene.

...

Ez te ji dil û can silav dikim, destên dê û bavê te maç dikim.

Bimîne di nav xêr û xweşiyê de! Li benda nameya te me.

**Hêlîn Baran**

**Pirsên li jêr li gorî nameya li jor bibersivînin.**

1- Kî nameyê dişîne?

..................................................

2- Kî nameyê digire?

..................................................

3- Mala Hêlînê di avahiyeke çawa de ye?

..................................................

4- Avahî çend tebeqe ye?

..................................................

5- Di her tebeqeyê de çend mal hene?

..................................................

6- Ji şaneşînê çawa sûdê digirin?

..................................................

7- Di xênî de asansor heye?

..................................................



## E- Odeya Hêlînê

Ev odeya Hêlînê ye. Di odeyê de du pace hene. Yek li aliyê çepê ye, yek jî li aliyê rastê ye. Li ber paceya aliyê rastê pirtûkxaneyeke mezin heye. Di vê pirtûkxaneyê de pirtûk û lênûskên Hêlînê hene. Di nava pirtûkxaneyê de televizyoneke biçûk balê dikişîne. Li aliyê rastê yê pirtûkxaneyê rûniştekek, li aliyê çepê yê pirtûkxaneyê cildankek heye. Li ser deriyê cildankê wêneyên xweşik hene.

Li aliyê çepê paceyeke din heye. Li ber vê paceyê nivîngehek heye. Li ser nivîngehê nivînek raxistî ye. Li raserî nivîngehê wêneyek balê dikişîne. Li aliyê rastê yê nivîngehê pirtûkxanyek biçûk heye, li raserî pirtûkxaneyê demjimêreke dîwaran xuya dike. Li hêla çepê komîdînek, li kêleka komîdînê şîfonyerek heye, li ser şîfonyer û komîdînê pêlîstokek hene. Li ber komîdîn û şîfonyer, li erdê xalîçeyekî rengî raxistî ye. Di odeya Hêlînê de rengê xemrî serdest e. Odeya Hêlînê gelekî birêkûpêk û xweşik e.

**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1. Di odeya Hêlînê de çend pace hene?

......................................................

2. Li ber paceya aliyê rastê çi heye?

......................................................

3. Cildank li kîjan aliyê pirtûkxaneyê ye?

......................................................

4. Televizyon li ku derê ye?

......................................................

5. Li ber paceya aliyê çepê çi heye?

......................................................

6. Xalîçe li ku raxistî ye?

......................................................


84

## F- Rêziman

# 1- Daçek

| daçek/pêşdaçek | navdêr, hoker | paşdaçek | lêkera kişandî |
|---|---|---|---|
| Li | malê | | dimîne. |
| Bi | balafirê | | diçe. |
| Ji | dibistanê | | tê. |
| Di | bajêr | de | dijî. |
| Ji | Zozanê | re | bibêje. |
| Ji | jor | de | tê. |
| Bi | ku | ve | diçe. |
| Ji | dûr | ve | dixuye. |
| Bi | ser | de | digire. |
| Di | daristanê | re | dibore. |
| Bi | dîwêr | ve | daliqîne. |

**Bi** aliyê te **de** nayê.
Ez **ji** Wanê me.
Ev **bi** çiqasî ye ?
Em **bi** ku **ve** biçin ?
Em **li** Ruhayê dijîn.
Zozan **bi** lezgînî diçe malê.

**Li** pey hev diçin.
**Li** cem me rûdine.
**Li** aliyê çepê menêre.
Ew **ji** dûr **ve** hev nas dikin.
Serheng **di** nav rezan **re** derbas dibe.
**Di** nav avê **de** avjeniyê dikin.

# 2- Peyvsazî

### Peyvên hevedudanî

| peyva yekemîn | peyva duyemîn | peyva hevedudanî |
|---|---|---|
| roj | baş | rojbaş |
| spas | xweş | spasxweş |
| pel | şîn | Pelşîn |
| çav | reş | çavreş |
| rê | nas | Rênas |
| kêf | xweş | kêfxweş |
| roj | name | rojname |
| çar | yek | çaryek |
| sor | gul | Sorgul |
| dil | şa (şad) | Dilşa |

### Cihên vala dagirin.

**1.** ......quncê rastê cildankek heye.
**2.** Li ..... şîfonyerê jî guldankek heye.
**3.** Mala me ...... avahiyeke mezin de ye.
**4.** Li ...... maseyê kursiyek heye.
**5.** Min çakêtê xwe .... hilço ve daliqand.
**6.** Sosin ....min re hat dibistanê.
**7.** Te çima ..... min re negot?
**8.** ..... ber mala me re derbas bû.

## A - Xebata li ser peyvan

### 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

**welat al tixûb bajar tax ziman kuçe navçe gund**

1- ..................... Baxdayê li Iraqê ye.
2- Navê .................. min Germenistan e.
3- Rengê ................ me kesk, sor û zer e.
4- Li .............. me sînemayek heye.
5- .................... fermî yê Îranê farisî ye.
6- Bajarê Antaqyayê li ser ............... Sûriyeyê ye.
7- Dêrik ................. Mêrdînê ye.
8- Dara navê ........ dîrokî yê Nisêbînê ye.
9- Mala me di ....... teng de ye.

### 2- Nêçîra peyvan

1. ŞANEŞÎN.................................
2. .......................................
3. .......................................
4. .......................................
5. .......................................
6. .......................................
7. .......................................
8. .......................................
9. .......................................
10. ......................................

| | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| X | **Ş** | **A** | **N** | **E** | **Ş** | **Î** | **N** | M | E | D |
| P | Q | E | P | W | A | O | S | G | R | E |
| A | K | X | A | N | Î | L | H | E | R | K |
| L | J | A | M | A | L | Q | O | Y | U | C |
| G | M | N | A | S | D | N | L | G | H | I |
| E | T | H | S | I | V | D | E | R | F | L |
| H | S | E | R | Ş | O | K | E | D | Ê | D |
| P | I | R | T | Û | K | X | A | N | E | A |
| L | R | T | Y | D | Î | W | A | N | T | N |
| I | W | E | P | A | L | D | A | N | G | K |
| N | T | A | M | E | Ş | U | N | S | D | Y |
| D | T | Ê | K | B | E | R | A | Y | Ê | Ê |

### 3- Cihên vala dagirin.

| WELAT | NETEWE | ZIMAN |
|---|---|---|
| ............. | tirk | ....... |
| Almanya | ............ | almanî |
| Îran | fars | ................ |
| Amerîka | amerîkî | ................ |
| ............ | ............. | japonî |
| Kûba | ............. | ............... |
| ................ | kurd | ............... |
| Fransa | ................. | ............... |
| Îngilistan | îngiliz | ................ |
| .................. | ermenî | ............... |
| Sûriye | .......... | erebî |
| Îsraîl | ................ | îbranî |

## B - Xwendin

### 1- Bajarê me

Navê bajarê me Agirî ye. Ew bajarekî dîrokî û mezin e. Navê wî yê berê Qerekose ye.

Çiyayê Agirî di nav tixûbên bajêr de ye. Nifûsa Agirî bi bajarok, belde û gundan ve 500 hezar e. Çemê Muradê yê bi nav û deng di kêleka bajêr re derbas dibe.

Di rojhilatê bajêr de navçeya wê Bazîd heye. Bazîd cihekî dîrokî ye. Qesra Îshaq Paşa û gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ne. Her roj bi dehan kes li nava qesrê digerin û diçin serdana gora Ehmedê Xanî.

### 1- Ji hevokên li jêr yên rast bin, bi (r) yên çewt bin, bi (ç) xêz bikin

| | Hevok | r | ç |
|---|---|---|---|
| 1 | Navê berê yê Agirî Qerekose ye. | ✓ | |
| 2 | Agirî bajarekî nû ye. | | |
| 3 | Çiyayê Agirî di nav tixûbê bajarê Agiriyê de ye. | | |
| 4 | Nifûsa bajêr bi tevahî 500 hezar e. | | |
| 5 | Çemê Muradê di nav Agirî re derbas dibe. | | |
| 6 | Bazîd li rojavayê bajêr dimîne. | | |
| 7 | Qesra Îshak Paşa li Bazîdê ye. | | |
| 8 | Gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ye. | | |
| 9 | Bazîd girêdayî Wanê ye. | | |
| 10 | Gelek kes Qesra Îshak Paşa ziyaret dikin. | | |

## 2- Wendy qala welatê xwe dike.

Ez ji Hollandayê me, welatê min welatekî biçûk e. Ew li rojavayê Ewropayê ye.

Hollanda dikeve ser tixûbên du welatan: li rojhilat Almanya û li başûr jî Belçîka. Li aliyê rojava ve ew dikeve ser deryaya Bakur. Rûberê wê 41.526 kilometrên çargoşe ye. Nifûsa wê 16 mîlyon e.

Sîstema deshilata Hollandayê parlamenterî ye. Her wisa welatekê şahnişîn e. Ew ji 12 parêzgehan pêk hatiye. Zimanê fermî yê Hollandayê hollandî ye.

Paytexta wê Amsterdam e. Ew bajarekî gelekî xweş e.

Li Amsterdamê gelek avahiyên dîrokî hene. Li Amsterdamê kanal hene. Ew kanal li cihekî din nîn in, xweserî wê derê ne.

Her çiqas Amsterdam paytext e jî lê belê Den Haag (Lahey) navenda deshilata Hollandayê ye.

Holland yek ji welatên dewlemend e. Ji ber ku li bajarê Rotterdamê bendereke navneteweyî heye. Bi sedan keştiyên bazirganî rojane têne vê benderê. Hollanda di warê pîşesazî, çandinî û teknolojiyê de jî pêşketî ye.

Hollanda bi dewlemendiya cureyê gulan navdar e. Her sal bi bihaye milyonan ev gul têne firotin.

Li Hollandayê daristan pir in û gelekî xweş in.

Bajarê ku ez lê dijîm, navê wî Leiden e. Ev bajar, bajarekî dîrokî ye. Dîrokeke wî ya dûr û dirêj heye. Bo nimûne, zanîngeha ku ez lê dixebitim, li Hollandayê zanîngeha kevntirîn e. Ez ji welatê xwe gelekî hez dikim.

**Bersiva van pirsên li jêr bidin.**

**1-** Hollanda li ser kîjan parzemînê ye?

...............................................

**2-**Li rojhilata Hollandayê kîjan welat heye?

...............................................

**3-** Nifûsa Hollandayê çiqas e?

...............................................

**4-** Sîstema deshilata Hollandayê çi ye?

...............................................

**5-** Zimanê fermî yê Hollandayê çi ye?

...............................................

**6-** Navê paytexta Hollandayê çi ye?


...............................................

**7-** Li kîjan bajarê Hollandayê bendereke navneteweyî heye?

...............................................

**8-** Hollanda bi çiyê xwe navdar e?

...............................................



## Deriyên Sûrên Amedê

Amed berê di nav sûran de bû. Sûrên Amedê di nav cihanê de bi nav û deng e. Sûr bi dirêjayî û mezinaya xwe di cihanê de piştî Dîwarê Çînê di rêza duyemîn de cih digirin. Armanca avakirina sûran parastina bajêr bû. Di serî de çar deriyên Sûrên Amedê hebûn. Sê derî jî paşê vebûn û hejmara deriyan bû heft. Li bakurê bajêr "Deriyê Çiyê", li rojava "Deriyê Rihayê", li başûr "Deriyê Mêrdînê", li roj-hilat "Deriyê Nû" hene. Ji bilî van deriyan deriyek jî nêzikî Deriyê Çiyê heye. Ji vî derî re jî "Deriyê Sarayê" dibêjin. Du deriyên din jî di demên dawiyê de vebûn. Çemê Dîcleyê di ber sûran re derbas dibe. Li ber çem baxçeyên Hewselê hene. Dîmenên baxçeyan ji ser sûran gelekî xweş e. Ji ser sûran Pira Dehderî xuya dike.

### 3. Beşên hevokên ku hev temam dikin bigihînin hev.

1. Bajarê Amedê
2. Sûrên Amedê
3. Heft deriyên
4. Deriyê Çiyê
5. Çemê Dîcleyê
6. Li ber Çemê Dîcleyê
7. Ji ser sûran

a. li bakurê bajêr e.
b. di ber sûran re derbas dibe.
c. pir bi nav û deng in.
d. berê di nav sûran de bû.
e. Baxçeyên Hewselê hene.
f. Sûrên Amedê hene.
g. Pira Dehderî xuya dike.

| 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 |
|---|---|---|---|---|---|---|
| d | | | | | | |

# C- Hîndariyên rêzimanî

## Daçek

### 1- Cihên vala yên li jêr bi daçekan dagirin.

1- Mala me ..... Amede ye.
2- Ez .... Zanîngehê ..... dixwînim.
3- Ew ...... nav daristanê .......derbas dibe.
4- Pîrika min ...... me ...... çîrokan dibêje.
5- Ez ........ mala xaltîka xwe hatim.
6- Mizgîn ....... aliyê jêr...... dimeşe.
7- Evînê wêneyek ....... dîwarê odeya xwe ....... daliqand.
8- Komek zarok ...... aliyê çepê ....... tên.
9- Em ......... keştiyê çûn Girava Axtamarayê.
10- Mala Zozanê ....... dûr ....... xuya dike.

## Peyvsazî

### 2- Van peyvan bigihînin hev û peyvên hevedudanî çêkin.

| Peyva yekemîn | Peyva duyemîn | Peyva hevedudanî |
|---|---|---|
| 1. çav | a. baş | çavşîn |
| 2. roj | b. mîr | .................. |
| 3. yek | c. reş | .................. |
| 4. pis | d. hilat | .................. |
| 5. dot | e. name | .................. |
| 6. dil | f. mam | .................. |
| 7. dep | g. xweş | .................. |
| 8. dem | h. şîn | .................. |
| 9. şev | i. şem | .................. |
| 10. sal | j. ziman | .................. |
| 11. rê | k. sal | .................. |

# unîte 8 PÊŞKETIN

- têkberên elektronîk
- kompîtur û înternet
- weşana bi kurdî
- rêziman

## A- Têkberên elektronîk

**1- Navdêrên di nava qadê de di bin wêneyan de binivîsin.**

cilşo firin firaqşo sarinc televîzyon şofben kompîtur tozmij



1) ..............................



2) ..............................



3) ..............................



4) ..............................



5) ..............................



6) ..............................



7) ..............................



8) ..............................

## 2- Kirîna têkberan

**Kawa** Em îro biçin têkberên nava malê bikirin.

**Şermîn** Baş e, jixwe zêde dema me nema.

**Kawa** Ka em lîsteyekê amade bikin.

**Şermîn** Rast e, bêyî lîste nabe.

**Kawa** Tu bibêje, ez binivîsim.

**Şermîn** Çilşo, sarinc, firin, tozmij, televîzyon...

**Kawa** Wekî din, gelo em firaqşoyekê jî nekirin?

**Şermîn** Niha ne pêwîst e, em ê firaqên xwe bi destan bişon.

**Kawa** Baş e, her wiha em kompîturekê jî bikirin.

**Şermîn** Bila be. Gelo li malê xeta telefonê heye?

**Kawa** Erê, lê em ê înternetê jî girê bidin.

**Şermîn** Ew karê paşê ye.

**Kawa** Ev qas bes e. Nexwe em herin.

**Şermîn** Em biçin, dibe ku li firoşgehê jî hin tişt bên bîra me.

**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1. Şermîn dixwaze kîjan têkberan bikire?

   ......................................................

2. Ew ê firaqşoyekê jî bikirin an na?

   ......................................................

3. Ew ê niha înternetê jî girê bidin?

   ......................................................

4. Kawa û Şermîn diçin ku derê?

   ......................................................





## 3- Li malê têkberên elektronîk

**Gulçîn** Tu bi xêr hatî.
**Binevş** Di nav xêrê de bî.
**Gulçîn** Tu çima ev qas dereng mayî?
**Binevş** Li malê gelek kar hebû. Bawer bike ez ji serê sibê ve rûniştime.
**Gulçîn** Çima te çi kar kir?
**Binevş** Ez serê sibê rabûm, min taştê amade kir. Piştre min zarok şandin dibistanê. Paşê, min tozmij vekir û nava malê malaşt. Min nava malê hinekî berhev kir. Ji êvar de hinek firaqên qirêjî hebûn, min ew xistin firaqşoyê. Hevjînê min êvarê hinek kinc avêtin cilşoyê, min ew raxistin.
**Gulçîn** Bi rastî tu gelekî jêhatî yî. Li mala me van karan Ferzende dike. Ez bi xwe tenê xwarinê amade dikim, wekî din ez têkilî tu karî nabim.
**Binevş** Hevgîn jî hinek karan dike, lê karê wî zêde ye, jixwe bi derengî tê malê, lewre jî ez naxwazim ew zêde karê malê bike.
**Gulçîn** De baş e, ka ez ji te re çay û paste bînim, hinekî bêhna xwe vede...
**Binevş** Spas, mala te ava.
**Gulçîn** Mala te jî ava.


**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1. Binevş çima dereng ma?
   ..................................................
2. Binevşê çi kar kir?
   ..................................................
3. Di mala Gulçîne de karên malê kî dike?
   ..................................................
4. Hevgîn çima karê malê zêde nake?
   ..................................................
5. Gulçînê ji bo Binevşê çi amade kir?
   ..................................................

## B- Kompîtur û înternet

### 1- Pirsên li jêr nîqaş bikin.

*1) Hûn kompîturê bi kar tînin?*
*2) Hûn kompîturê bi çi armancê bi kar tînin?*
*3) Bandora înternetê li ser jiyana we çi ye?*




Di roja îroyîn de gelek amûrên nû yên ragihandinê derketine. Êdî em bêyî van amûran nikarin bijîn. Ji van a herî girîng kompîtur e. Di jiyana me de kompîtur cihekî gelekî girîng digire.
Wekî mînak, kompîtura min pir bi kêrî min tê. Ez nivîsên xwe li ser kompîturê dinivîsim. Tiştekî ku girîngiya kompîturê zêde dike jî înternet e. Em dikarin gelek agahiyên pêwîst bi riya înternetê peyda bikin. Her wiha di înternetê de tîşkename (e-mail) jî gelekî girîng û pêwîst e. Êdî kes nameyan ji hev re naşîne, li şûna wan, tîşkenameyan ji hev re dişînin.
Li ser tora înternetê, gelek malpar hene. Hinek malper namedankan jî didin bikarhênerên xwe. Mirov dikare di ser namedankan re peyamhinêrê (msn) jî bi kar bîne. Ez bi xwe jî peyamhinêrê bi kar tînim. Her wiha kameraya min jî heye, ez dikarim bi hevalên xwe yên dûr re rasterast bipeyivim. Ji bo ku deng neçe derve jî, ez berguhkê bi kar tînim. Ez bi berguhkê li stranan jî guhdariyê dikim. Ez ji ser înternetê hinek bernameyên nû dadixim, hin caran jî stranên mp3 û dîmenên mp4 dadixim.
Amûreke din a girîng jî telefona destan e, ez bi riya telefonê dikarim peyaman ji hevalên xwe re bişînim, her wiha ez dikarim li radyo û muzîkê jî guhdariyê bikim. Êdî em dikarin bi riya telefonê bikevin înternetê jî. Van amûran jiyana me gelekî hêsan kiriye. Em dikarin bi nas û dostên xwe re danûstandinê bikin, lê ev amûrên nû, nikarin cihên sohbeteke xweş a rû bi rû, nivîsandina nameyekê û di sînemayê de temaşekirina li fîlmekî bigirin.

### 2- Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.

**1.** Ji amûrên serdema nû ya herî girîng kîjan e?
..................................................


**2.** Nivîskar çawa ji kompîturê sûdê werdigire?
..................................................

**3.** Em bi riya înternetê dikarin çi bikin?
..................................................

**4.** Bi kîjan amûrê mirov dikare bi hevalên xwe bipeyive?
..................................................

**5.** Îro cihê nameyan çi girtiye?
..................................................

**6.** Telefona destan bi kêrî çi tê?
..................................................




## C- Weşana bi kurdî

### 1- Kî dizane?

**1-** Yekemîn rojnameya kurdî kîjan e?
**a)** Hawar **b)** Roja Nû **c)** Riya Teze **d)** Kurdistan

**2-** Kê kovara Hawar derxistiye?
**a)** Cegerxwîn **b)** Celadet Bedirxan **c)** Pîrêmêrd **d)** Ereb Şemo

**3-** Yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye kîjan e?
**a)** Radyoya Erîvanê **b)** Radyoya Tehranê **c)** Şerq el Adna **d)** Dengê Mezopotamya

**4-** Yekemîn televîzyona peykî ya kurdî kîjan e?
**a)** Xebat Tv **b)** Roj Tv **c)** Med Tv **d)** Kurdistan Tv





## 2. Çapemeniya kurdî

**Diyar** Yekemîn rojnameya kurdan kîjan e, Azad?

**Azad** Yekemîn rojnameya kurdan "Kurdistan" e. Ew di 22'yê Avrêla 1898'an de li Qahîreyê hatiye weşandin.

**Diyar** Kê ew rojname derxistiye?

**Azad** Ji malbata Bedirxaniyan Mîqdat Mîthat Bedirxan ew derxistiye.

**Diyar** Di wê demê de wekî din tu weşanên kurdan hene?

**Azad** Di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê gelek kovarên bi kurdî û Osmanî hatine derxistin. Wekî mînak kovarên Jîn Hetawî Kurd/Rojî Kurd, Kurdistan.

**Diyar** Piştî avakirina komarê van xebatan dom kiriye?

**Azad** Na. Mixabin piştî ku komara tirk hatiye avakirin, li Tirkiyeyê derfetên weşana bi zimanê kurdî nemane. Weşanên bi zimanê kurdî li parçeyên din ên Kurdistanê hatine derxistin.

**Diyar** Kîjan weşan hatine derxistin?

**Azad** Mirov dikare navê weşanên mîna Hawar, Ronahî, Roja Nû, Riya Teze, Zarî Kurmancî bide. Ji van Hawar ji bo pêşveçûna zaravayê kurmancî pir girîng e. Alfabeya latînî ya kurmancî cara yekemîn di vê kovarê de hatiye bikaranîn. Hawar di 15'ê Gulana 1932'an de derketiye. Ev roj niha wekî Cejna Zimanê Kurdî tê pîrozkirin.

**Diyar** Bi qasî ku ez dizanim li Bakur, di salên 1990'î de gelek kovar û rojnameyên mîna Welat, Rewşen, Tewlo, Pîne, Nûbihar, hatine weşandin.

**Azad** Niha jî li her çar parçeyên Kurdistanê bi sedan kovar û rojname hene. Niha sê rojnameyên rojane; Azadiya Welat, Xebat û Kurdistanî Nwê weşanê dikin.

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1. Yekemîn rojnameya Kurdan kîjan e?

   ..................................................

2. Rojnameye Kurdistanê li ku derê dest bi weşanê kiriye?

   ..................................................

3. Rojnameye Kurdistanê ji hêla kê ve hatiye weşandin?

   ..................................................

4. Di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê kîjan kovar hatine derxistin?

   ..................................................

5- Cejna Zimanê Kurdî kîjan roj e?

   ..................................................

6- Niha kîjan rojname bi kurdî rojane weşanê dikin?

   ..................................................

## 3. Radyo




Di dîrokê de yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye, radyoya Şerq el Adna ye. Ev radyo ji hêla Brîtanyayê ve hatiye damezirandin û li Jafnayê dest bi weşanê kiriye. Ji sala 1923'yan heta 1929'an li herêma xweser a kurdan a Yekîtiya Sovyetê bi kurdî weşana radyoyê hatiye kirin. Di sala 1941'ê de Hikûmeta Fransayê radyoyeke bi navê Radyoya Levant ava kiriye. Di vê radyoyê de jî di hefteyê de du caran 30 nîv saet weşan bi zimanê kurdî jî hatiye kirin û weşana vê radyoyê heta sala 1946'an dom kiriye.

Di dîroka ragihandinê ya kurdan de êzgehên radyoyê yên mîna Radyoya Êrîvanê, Radyoya Tehranê û Radyoya Baxdayê pir girîng in. Niha jî bi dehan radyo bi kurdî weşanê dikin. Hinek ji wan êzgehan ev in: Dengê Amerîkayê, Dengê Mezopotamya, Kurdistan Radio, Newa Kurd Radio, SBS-Kurdî (Awistralya), Radyo Zeyale (Swêd).

**Cihên vala li gorî nivîsa li jor dagirin.**

**1-** Di dîrokê de yekemîn radyoya ku bi kurdî weşan kiriye ............ ye.

**2-** Radyoya Şerq el Adnayê ji hêla ............... ve hatiye damezirandin.

**3-** Radyoya Levant heta sala ............... weşana xwe domandiye.

**4-** Sê radyoyên girîng ên di dîroka kurdan de cih girtine ......................, ............., ................ ne.

**5-** Navên sê radyoyên ku niha bi kurdî weşanê dikin ev in: ......................., ........................, .........................

## 4. Televîzyon

Yekemîn televîzyona bi kurdî Xebat Tv ye. Wê di sala 1992'yan de dest bi weşanê kiriye. Ew televîzyona herêmî niha jî bi navê K. TV weşana xwe didomîne. Yekemîn televîzyona peykî (satelaytî) Med Tv ye. Destpêka weşana wê jî 1995 e. Niha hejmara televîzyonên peykî ji 10'an derbas bûye. Hinek ji wan televîzyonan ev in: Roj Tv, MMC, Kurdistan Tv, KurdSat, Zagros Tv, Newroz Tv, Rojhilat Tv, Tishk Tv, Komala Tv û Sahar Tv...
Ji bilî van li ser înternetê bi sedan malperên bi kurdî hene. Ew malper dikarin hemû sînoran derbas bikin û bihêlin ku kurd ji hev agahdar bibin.

**Pirsên li jêr li gorî nivîsa li jor bibersivînin.**

1. Yekemîn televîzyona bi kurdî kîjan e?
   ..................................................
2. Xebat Tv kengî dest bi weşanê kiriye?
   ..................................................
3. Yekemîn televizyona peykî (satelaytî) kîjan e?
   ..................................................
4. Navên pênc televîzyonên ku bi kurdî weşanê dikin binivîsin.
   ..................................................

## D- Rêziman

# 1- Dema boriya dûdar

### Li gorî lêkerên negerguhêz

| lêker | rayeka dema borî | qertafa dema boriya dûdar | kirde | pêveber |
|---|---|---|---|---|
| çûn | çû | e/iye | Ez | çûme |
| | | | Tu | çûyî |
| | | | Ew | çûye |
| | | ne/ine | Em | çûne |
| | | | Hûn | çûne |
| | | | Ew | çûne |

### Li gorî lêkerên gerguhêz

| lêker | rayeka dema borî | qertafa dema boriya dûdar | kirde | bireser | pêveber |
|---|---|---|---|---|---|
| xwarin | xwar | e/iye | Min | sêv | Xwariye (yekjimar) |
| | | | Te | | |
| | | | Wî /wê | | |
| | | ne/ine | Me | | Xwarine (pirjimar) |
| | | | We | | |
| | | | Wan | | |

### Li gorî bireser kişandina lêkerên gerguhêz

| lêker | kirde | bireser | pêveber |
|---|---|---|---|
| dîtin | Te | ez | dîtime |
| | Min | tu | dîtiyî |
| | Wan | ew | dîtiye |
| | Wê | em | dîtine |
| | Me | hûn | dîtine |
| | Wî | ew | dîtine |

**Mînak:**

- Di roja îroyîn de gelek amûrên nû yên ragihandinê derketine.
- Di 22'yê avrêla 1898'an de li Qahîreyê jihêla Mîqdat Mîthat Bedirxan ve hatiye weşandin.
- Van amûran jiyana me gelekî hêsan kiriye.
- Îro cihê nameyan çi girtiye
- Di van salan de gelek weşanxane vebûne û wan bi sedan pirtûkên bi kurdî weşandine.

# 2- Avaniya tebatî

### Dema niha

| cînavkên kesane | lêkera alîkar (hatin) | lêkera bingehîn (dîtin) |
|---|---|---|
| Ez | têm | dîtin |
| Tu | têyî | |
| Ew | tê | |
| Em | tên | |
| Hûn | tên | |
| Ew | tên | |

### Dema bê

| cînavkên kesane | daçeka dema bê | lêkera alîkar (hatin) | lêkera bingehîn (girtin) |
|---|---|---|---|
| Ez | dê | bêm | girtin |
| Tu | dê | bêyî | |
| Ew | dê | bê | |
| Em | dê | bên | |
| Hûn | dê | bên | |
| Ew | dê | bên | |

### Dema boriya têdeyî

| cînavkên kesane | lêkera alîkar (hatin) | lêkera bingehîn (veşartin) |
|---|---|---|
| Ez | hatim | veşartin |
| Tu | hatî | |
| Ew | hate | |
| Em | hatin | |
| Hûn | hatin | |
| Ew | hatin | |

### Dema boriya dûdar


| cînavkên kesane | lêkera alîkar (hatin) | lêkera bingehîn (veşartin) |
|---|---|---|
| Ez | hatime | veşartin |
| Tu | hatiyî | |
| Ew | hatiye | |
| Em | hatine | |
| Hûn | hatine | |
| Ew | hatine | |

Her sal bi dehan pirtûk têne çapkirin.
Di destpêka sedsala bîstan de li Stenbolê Jîn û Rojî Kurd hatin derxistin
Rojnameya Kurdistan di sala 1898'an de li Qahîreyê hate weşandin.
Piştî ku komara tirk hat avakirin, Li Tirkiyeyê derfetên weşana bi zimanê kurdî neman.
Bi tenê, di sala 2007'an de 110 pirtûk hatin çapkirin.

## unîte 8 Spartek

# A - Xebata li ser peyvan

### 1- Li gorî wêneyan xaçepirsê dagirin.



### 1- Cihên vala bi peyvên li jêr dagirin.

**cilşo, sarinc, firaqşo, tozmij, malper, tîşkename, peyamhinêr, namedank**

**1-** Ez kincên xwe bi ............naşom.
**2-** Ew her roj li..................... xwe dinêre û ............ xwe dixwîne.
**3-** Ez duh ketim înternetê min ................dibistana me vekir.
**4-** Hogir îro bi riya ................ bi min re axivî.
**5-** Ez ê firaqên xwe bixim ...............
**6-** Ez malê bi ............. dimalim.
**7-** Ji bo ku sar bibe, em avê dixin ....................

## B- Xwendin

### Ragihandin

Ragihandin ji bo mirovan pir grîng e. Ji bo vê yekê xebat bêrawestan hatine domandin. Di sala 1887'an de Heinrich Hertz pêlên radyoyê derxistin holê. Di sala 1894'an de Oliver Lotge bêtêl û birûske îcad kirin. Di sala 1901'ê de jî Marconî radyo îcad kir. Teknolojiya radyoyê ya pêşketî guherînên nû afirandin. Teknolojiya sînema û radyoyê bi hev re hatin bikaranîn. Di dawiyê de jî televîzyon derket holê. Weşana televîzyonê cara yekemîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kir. Li Tirkiyê weşan di sala 1970'yî de pêk hat. Di sala 1984'an de weşana rengîn dest pê kir. Di warê ragihandinê de pêşketineke girîng jî îcadkirina telefonê ye. Mucîdê mezin Graham Bell di sala 1876'an de telefon îcat kir. Bi îcada telefonê re ragihandina navbera mirovan pir hêsan bû. Mesafeya di navbera mirovan de bi awayekî ji holê rabû. Ev xizmet bi lez û bez li her derê belav bû. Telefon piştî demekê bûn otomatîk, paşê jî telefon yekser ji têlan rizgar bûn. Niha jî telefon ketine berîkên mirovan. Îro em dikarin bi telefona xwe wêneyan bikêşin, dengan tomar bikin, dîmenan bikêşin, peyaman bişînin û bikevin înternetê. Her wiha em dikarin wêne, peyam, dengên tomarkirî ji kesên din re bişînin.

**1- Pirsên li jêr li gorî teksta li jor bibersivînin?**

**1-** Bêtêl û birûske kengî û ji hêla kê ve hatin îcadkirin?

..................................................

**2-** Weşana televîzyonê cara pêşîn kengî û li ku dest pê kir?

..................................................

**3-** Li Tirkiyeyê televîzyonê kengî dest bi weşana rengîn kir?

..................................................

**4-** Navê mûcîdê telefonê çi ye?

..................................................

**5-** Bi vedîtina telefonê re çi ji holê rabû?

..................................................

**6-** Îro em dikarin bi telefonê kîjan karan bikin?

..................................................

## C- Hîndariyên rêzimanî

**1- Van hevokan li gorî demên destnîşankirî biguherînin.**

**1-** Li ber mala me dibistaneke nû tê avakirin. (Dema boriya têdeyî)

..........................................................................

**2-** Par zêdetirî sed pirtûkên bi kurdî hatin weşandin. (Dema boriya dûdar)

..........................................................................

**3-** Îsal dê li Amedê mîhrîcaneke mezin were lidarxistin. (Dema niha)

..........................................................................

**4-** Li Amedê fîlmê Bahoz hate nîşandayîn. (Dem bê)

..........................................................................

**5-** Di destpêka sedsala nozdehan li Stenbolê gelek kovarên kurdî hatine weşandin. (Dema boriya têdeyî)

..........................................................................

## 2- Cihên vala bi lêkera alîkar a avahîna tebatî dagirin.

**1-** Li her derê kulîlk ........ çandin (dema boriya têdeyî)
**2-** Her roj mirovên azadîxwaz .......... girtin. (dema niha)
**3-** îro nebe jî sibe dê çareya şêrpenceyê ........... dîtin. (Dema bê)
**5-** Pirtûka Mehmet Uzun Siya Evînê ............. nasandin. (Dema boriya dûdar)

## 3- Van hevokên bi avaniya lebatî bikin forma tebatî.

**Mînak**

Di sala 1901'ê de Marconî radyo îcad kir.
Di sala 1901'ê de radyo (ji hêla Marconî ve) hate îcadkirin.

**1-** Mîqdat Mîthat Bedirxan di sala 1898'an de Rojnameya Kurdistan derxist.
........................................................................................................
**2-** Ehmedê Xanî di sala 1684'an de Nûbara Biçûkan nivîsand.
........................................................................................................
**3-** Di sala 1941'ê de hikûmeta Fransayê Radyoya Levant ava kiriye.
........................................................................................................
**4-** Kurdan heta niha zêdetirî deh televîzyonên peykê ava kirine.
........................................................................................................
**5-** Kurd her sal 22'yê rêbendanê de avabûna Komara Mehabadê pîroz dikin.
........................................................................................................
**6-** Şaredariya Amedê sala bê dê gelek parkên nû veke.
........................................................................................................

## 4- Van hevokên dema boriya têdeyî bikin dema boriya dûdar.

**Mînak**

Di sala 1894 de Oliver Lotge bêtêl û birûske îcad kirin.
Di sala 1894 de Oliver Lotge bêtêl û birûske îcad kirine.

**1-** Teknolojiya radyoyê ya pêşketî guherînên nû afirandin.
........................................................................................................
**2-** Weşana televîzyonê cara yekemîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kir.
........................................................................................................
**3-** Li Tirkiyê weşana televîzyonê cara pêşî di sala 1970 de pêk hat.
........................................................................................................
**4-** Mucîdê mezin Graham Bell di sala 1876 de telefon îcat kir.
........................................................................................................
**5-** Şerefxanê Bedlîsî pirtûka xwe ya dîrokê Şerefname di sala 1597'an de qedand.
........................................................................................................

## Lêker*

| rader | dema borî | dema niha |
|---|---|---|
| anîn | anî | tîne |
| avêtin | avêt | diavêje |
| axivîn | axivî | diaxive |
| barîn | barî | dibare |
| bersivandin | bersivand | dibersivîne |
| bezîn | beziya | dibeze |
| biraştin | biraşt | dibirêje |
| birin | bir | dibe |
| borîn | borî | dibore |
| bûn | bû | dibe |
| ceribandin | ceriband | diceribîne |
| civîn | civiya | dicive |
| çandin | çand | diçîne |
| çêkirin | çêkir | çêdike |
| dagirtin | dagirt | dadigire |
| daliqandin | daliqand | dadiliqîne |
| damezirandin | damezirand | dadimezirîne |
| dan | da | dide |
| danasîn | danasand | dadinasîne |
| daxistin | daxist | dadixe |
| derketin | derket | derdikeve |
| derxistin | derxist | derdixe |
| dîtin | dît | dibîne |
| domandin | domand | didomîne |
| firotin | firot | difiroşe |
| gerandin | gerand | digerîne |
| gerîn | geriya | digere |
| gihaştin | gihaşt | digihêje |
| girtin | girt | digire |
| gotin | got | dibêje |
| guhartin | guhart | diguhêre |
| guherîn | guherî | diguhere |
| hatin | hat | tê |
| hebûn | hebû | heye |
| herikîn | herikî | diherike |
| hilgirtin | hilgirt | hildigire |
| jiyîn | jiya | dijî |
| karîn | karî | dikare |
| ketin | ket | dikeve |
| kirin | kir | dike |
| kirîn | kirî | dikire |
| kişandin | kişand | dikişîne |
| kutan | kuta | dikute |
| kutandin | kutand | dikutîne |
| lîstin | lîst | dilîze |
| man | ma | dimîne |
| meşîn | meşiya | dimeşe |
| nasîn | nasî | dinase |
| nivîsîn | nivîsî | dinivîse |
| pehtin | peht | dipêje |
| peyivîn | peyivî | dipeyive |
| qedîn | qediya | diqede |
| qerisîn | qerisî | diqerise |
| qeşartin | qeşart | diqeşêre |
| qewimîn | qewimî | diqewime |
| rabûn | rabû | radibe |
| ragihandin | ragihand | radigihîne |
| raketin | raket | radikeve |
| raxistin | raxist | radixe |
| rûniştin | rûnişt | rûdine |
| sotin | sot | disoje |
| standin | stand | distîne |
| şandin | şand | dişîne |
| şûştin | şûşt | dişo |
| tewandin | tewand | ditewîne |
| vebûn | vebû | vedibe |
| vedan | veda | vedide |
| vegerîn | vegeriya | vedigere |
| vegotin | vegot | vedibêje |
| veqetandin | veqetand | vediqetîne |
| veşartin | veşart | vedişêre |
| vexwarin | vexwar | vedixwe |
| wergerandin | wergerand | werdigerîne |
| wergirtin | wergirt | werdigire |
| weşandin | weşand | diweşîne |
| weşîn | weşiya | diweşe |
| xebitîn | xebitî | dixebite |
| xistin | xist | dixe |
| xwarin | xwar | dixwe |
| xwestin | xwest | dixwaze |
| zanîn | zanî | dizane |
| zivirîn | zivirî | dizivire |

* Lêker li gorî kesê/a seyêm hatine kişandin.

# BERSIVDANK

## UNÎTE 1 NASÎN

**A Hevnasîn**
4- çawa / ez / yî / im / navê / ku / ji /
6- te / min / navê / Azad / ku / ji / ez
7- Bersivên xwendekaran
8- Bersivên xwendekaran

**D- Nasîna kes û tiştan**

**3- Navên van tiştan li bin wan binivîsin.**
1-kaxiz, 2- çente,3- pênûs, 4- qelemtraş, 5- rastkêş, 6- jêbir, 7- ferheng, 8- kursî, 9- pirtûk, 10- lênûsk, 11- kilspî, 12- nexşe, 13- demjimêr, 14- pênûsdank

**SPARTEK**

**A- Xebata li ser peyvan**

***1- xaçepirs***
1- rastkêş, 2- lênûsk, 3- demjimêr, 4- pirtûk, 5- pênûsdank, 6- salname, 7- jêbir

***2- Nêçîra peyvan***
1) şevbaş, 2) pirtûk, 3) rojbaş, 4) mase, 5) lênûsk, 6) xwendekar, 7) kilspî, 8) jêbir, 9) spas 10) mamoste, 11) dep

**B- Bikaranîna zimên**
1- navê / e / çi / min / ku/ yî/ ji / me / ji/ me / bi / kêfxweş / jî /
2- êvarbaş / çawa / ez / im / ez / baş

**3- Hevokan bigihînin hev.**
1d, 2e, 3b, 4c, 5a

4- kî / e/ kî / Pelşîn / Azad/ im / ew / e / ew / Rizgar / hûn / Azad

5- çi / çi / e / ne / ev / ne / ew / ye / ew
6- Pirsan binivîsin.
1- Navê te çi ye?
2- Tu kî yî?
3- Tu ji ku yî?
4- Lezgîn ji ku derê ye?
5- Ew çi ye?
6- Ev çi ye?
7- Hûn ji ku derê ne?
8- Ew kî ye?
9- Ev kî ye?
10- Ew çi ne?

**C- Hîndariyên Rêzimanî**
1- ye / ye / e / e / ye / e
2- im / î / e / in / in / in
3- me / yî / ye / ne / ne / ne

## UNÎTE 2 MALBAT

**A- DANASÎNA KESÊN DI MALBATÊ DE**
**Malbata Dîlanê**
1- Di mala wê de heft kes hene.
2- Rodî bavê Dîlanê ye.
3- Navê wê Dilşa ye.
4- Xwîşk û birayekî wê hene.
5- Navê dapîra wê Xecê ye.
6- Qenco bapîrê Dîlanê ye.

**B- HEJMAR**
**2- Diyalog**
1-Hêlîn hevdeh salî ye.
2- Dîlan hejdeh salî ye.

**3- Bersivên xwendekaran**

**C- HEYE/ HENE**
**1- Çend xwîşk û birayên te hene?**
1- Sê xwîşkên Azad hene.
2- Birayekî Azad heye.
3- Xwîşkek û du birayên Diyar hene.

**D- DANASÎNA XIZMAN**
2- Cihên vala dagirin.
1-bapîrê, 2- biraziyê, 3- bûka, 4- bûra, 5- neviya, 6- xwarziya, 7- xwîşka, 8- tiyê, 9- hevjîna

**E- DANASÎNA HEVAL Û HOGIRAN**
**1- Bersivên pirsan binivîsin.**
1) Azad hejdeh salî ye.
2) Azad di polan çaran de ye.
3) Di fêrgeha Azad de sih û pênc kes hene.
4) Berpirsa fêrgehê Dîlan e.

**F- KAR Û PÎŞE**

**1- Pirsên li jêr li jorî nivîsê bibersivînin.**

1- Ew mamoste ye.
2- Ew pêncî û pênc salî ye.
3- Du birayên wê hene.
4- Ew rojnamevan e.
5- Navê wê Şîlan e.
6- Du kurên wî hene.

**2- Cihên vala dagirin.**

1- mamoste, 2- bazirgan, 3- bijîşk, 4- rojnamevan, 5- ajokar, 6- hunermend, 7- karker, 8- firoşkar

**G- Hîndariyên Rêzimanî**

1- Qertafên nebinavkirinê
1) -ek, 2) -in, 3) -ek, 4) –in

**2- Vetandekên binavkirî**

1) -a 2) -ê 3) -ên 4) -a 5) -ê / -a 6) -ê / -a

**3- Veqetandekên nebinavkirî**

1) -ekî 2) -ine 3) -ekî 4) -eke 5) -eke 6) –ine

**4- Valahiyan dagirin.**

1) -a, 2) -ê, 3) -ên, 4) -eke, 5) -eke, 6) -eke/-ekî, 7) -ek, 8) -in

## SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Neçîra peyvan**

1- dapîr, 2- xwîşk, 3- bav, 4- dotmam, 4- met, 5- ap, 6- keç, 7- bira, 8- dê, 9- bapîr, 10- law, 11- mam, 12- xaltî

**2- Hevokan li jêr bigihînin hev**

1b, 2d, 3c, 4a, 5e

**B- Hejmar**

**1- Hejmarên li jêr bi nivîskî binivîsin.**

yek, du, sê, çar, pênc, şeş, heft, heşt, neh, deh, yazdeh, dozdeh, sêzdeh, çardeh, pazdeh, şazdeh, hevdeh, hejdeh, nozdeh, bîst, bîst û yek

**C- Bikaranîna zimên**

**1- Cihên vala dagirin**

1) min/ navê/ wê,
2) e / navê/ çi / ye / wî / e / çend / ye / ew / salî / ye
3) navê / rojbaş / Besna / ye / min / e/ salî / ez / me

**2- Hevokan bigihînin hev.**

1c, 2e, 3a, 4b, 5d

**3- Cihên vala dagirin.**

1) te / hene / navên / navê
2) hene/ min / navê / birayê
3) hene/ min / ne / in

**4- Danasîna Jiyan**

1a, 2d, 3c, 4b

**5- Valahiyan dagirin.**

e / im / min / e / hene / min / e / min / ye / min / heye

**6- Rast û çewt**

1- çewt, 2- çewt, 3- rast, 4- çewt, 5- rast, 6- çewt, 7- rast

**D- Hîndariyên Rêzimanî**

**1- Cihên vala dagirin.**

1) min, 2) te, 3) wî, 4) wê, 5) me, 6) wan.

**2- Cihên vala dagirin.**

1) -a, 2) -yê, 3) -ê,4) -yê, 5) -ên, 6) -yên, 7) -ê, 8) -a, 9) -ên, 10) -yên, 11) -ên, 12) -ê, 13) -yê, 14) -a

**3- Cihên vala dagirin.**

1) -eke, 2) -yekî, 3) -eke 4) -yekî, 5) -ekî, 6) -eke, 7) -ine, 8) -eke, 9) -yekî, 10) -ekî, 11) -ekî

# UNÎTE 3 DEM Û SAL

**C-ROJEKE DÎLANÊ**

1- Dîlan her roj serê sibê zû radibe.
2- Ew taştêya xwe dixwe.
3- Waneyên wê nîvro diqedin.
4- Ew firavîna xwe li malê dixwe.
5- Tevî malbata xwe şîvê dixwe.
6- Dîlan spartekên xwe piştî şîvê çêdike.
7- Ew li televîzyonê temaşe dike û radikeve.

**D-BERNAMEYA DÎLANÊ YA HEFTANE**

1- Ew roja duşemê diçe avjeniyê.
2- Ew roja sêşemê beşdarî xebatên şanoyê dibe.
3- Dîlan roja çarşemê li malê dimîne.
4- Ew roja pêncşemê dema xwe bi hevalên xwe re derbas dike.
5- Ew roja înê diçe kursa gîtarê.

**E- RÊZIMAN**

**1- Dema niha**

1- dixwînim
2- naxwe
3- vedixwî
4- radibin
5- diçe
6- temaşe dikin
7- ranakevim
8- dinivîsî

**2- Tewang**

**1) Cihên vala dagirin**
1) -yê, 2) -î, 3) -ê, 4) -an

**2) Cihên vala dagirin.**
1) -ekî, 2) -ekî, 3) -inan 4) -ekê

## SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**
**1- Cihên vala dagirin.**
1) havîn, 2) payîz, 3) kulîlk, 4) berf, 5) peyk,
6) gerestêrk, 7) fêkî, 8) sar

**2- Navên mehan**
Bihar: adar, avrêl, gulan
Havîn: pûşper, tîrmeh, gelawêj
Payîz: rezber, kewçêr, sermawez
Zivistan: berfanbar, rêbendan, reşemî

**3- Neçîra peyvan**
1) payîz
2) bihar
3) havîn
4) zivistan
5) avrêl
6) adar
7) sermawez
8) gelawêj
9) gulan
10) reşemî

**4- Cihên vala dagirin.**
demsal / biharê / kulîlk / havîn / germ / fêkî / payîz / pel / baran / dibistan / sar / berf

**5- Beşên hevokan bigihînin hev.**
1d, 2e, 3a, 4b, 5c, 6g, 7f

**B- BIKARANÎNA ZIMÊN**
**1- Lêkerên li jêr li gorî dema niha bikişînin.**
1) diçim, 2) tên, 3) nake, 4) vedike, 5) radikeve, 6) naçin, 7) naxwin, 8) dişo, 9) naxwazî, 10) venaxwe

**2- Bi bêjeyên li jêr hevokan çêkin.**
1) Ez tu car taştê naxwim.
2) Hêlîn li Kerboranê dijî.
3) Em azadiyê dixwazin.
4) Tu li televîzyonê temaşe dikî?
5) Ew ji avjeniyê hez dike.
6) Em carinan diçin geştê.
7) Jiyan bi şev dereng radikeve.

**3- Van lêkeran li gorî dema niha bikişînin.**
hişyar dibe / dişo / dixwe / diçe / diqedin / tê / dilîze / çêdike / radikeve

**4- Rast û çewt**
1) rast, 2) çewt, 3) rast , 4) çewt, 5) çewt, 6) çewt

**5- Bersivên xwendekaran**
**6- Cihên vala dagirin.**
**1) Qertafên tewangê yên binavkirî**
1) -ê, 2) -an, 3) -ê, 4) -an, 5) -î, 6) -î, 7) -ê, 8) -ê

**2) Qertafên tewangê yên nebinavkirî**
1)-inan, 2) -ekê, 3) -ekî, 4) -inan, 5) -inan, 6- ekê, 7) -yekê, 8) -ekê

## UNÎTE 4 PÊDIVÎ

**A- LI MALÊ**
**1- Danên xwarinê**
1- Ew dixwaze hêkekê bixwe.
2- Pelîn şîr venaxe.
3- Serhat ji mêst hez dike.
4- Dîlan ji dimsê pir hez dike.
5- Li gorî Serhat hêkerûn û qelî pir xweş in.

**B- RÊZIMAN**
**1- Lêkerên li jêr bikin forma raderî**
1) kirin, 2) anîn, 3) kirîn 4) kirin, 5) vekirin, 6) girtin, 7) pehtin, 8) biraştin

**2- Cihên vala dagirin**
1) bixwim, 2) bikire, 3) dixwazî, 4) hîn bibin

**C- LI SÛKÊ**
**1- Navên sebze û fêkiyan**
**Navên van fêkî û sebzeyan binivîsin.**
1) alû, 2) balîcan, 3) gêzer, 4) hejîr, 5) vîşne, 6) zebeş, 7) hinar, 8) îsot, 9) hirmî, 10) kartol, 11) lîmon, 12) şemamok 13) pîvaz, 14) mişmiş 15) fasûlî, 16) firengî, 17) gilgil, 18) kelem, 19) tûzik, 20) tû, 21) bexdenûs, 22) tiriyê reş, 23) mandalîna, 24) kundir, 25) tiriyê zer, 26) porteqal, 27) sêv, 28) xiyar, 29) xox, 30) sîr

**2- Rodî fêkiyan dikire**
1) Rodî dixwaze sê kîlo sêv bikire.
2) Rodî du kîlo tiriyê reş dikire.
3) Sertac dê kîloyek hinar bikire.
4) Pêwîstiya wî bi baqek pîvazên ter heye.
5) Ji ber ku mêvanên wî hene.

**3- Kiriyarî**

**a- Beşên hevokan bigihînin hev.**

1b, 2d, 3a, 4e, 5c

**D- CIL Û BERG**

**1- Navên cilan li bin wêneyan binivîsin.**

1- dêre, 2- gore, 3- derpê, 4- fîstan, 5- lepik, 6- şal, 7- kurtek, 8- şimik, 9- binkiras, 10- sako, 11- sol,

**2- Li firoşgeha cil û bergan**

**Pirsên li jêr li gorî diyaloga li jor bibersivînin.**

1- Reyona cil û bergên jinan li qata herî jor e.
2- Evîn fîstanekî gulgulî dixwaze.
3- Zozan dixwaze dêreyeke sor bikire.
4- Dêre li bejna Zozanê hat.
5- Ji ber ku fîstan fireh e.

**E-RÊZIMAN**

**2- Cihên vala bi rengderên hevrûkirî dagirin.**

1- *hêdîtir / lezgîntir,* 2- bilindtir/ nizmtir, 3- tirştir/ şîrîntir, 4- biçûktir / mezintir, 5- dirêjtir / kintir, 6- nermtir / hişktir

SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1-Navên tiştan binivîsin.**

1) firengî, 2), tivir, 3) gûz, 4) kelem, 5) alû, 6) zebeş, 7) balîcan, 8) tirî, 9) zerdelî, 10) vîşne

**2- Tabloya cil û bergan**

jin: fîstan, dêre, deling, laçik, binkiras
mêran: kurtek, şal, suxme, sako
hevpar: derpê, sol, şimik, palto, lepik, gore, kiras

**3- Neçîra peyvan**

1) kurtek, 2) gore, 3) şal, 4) ranîk, 5) dêre, 6) derpê, 7) fîstan, 8) sol, 9) sako

**B- Bikaranîna zimên**

**1- Valahiyan dagirin.**

zebeşekî / çend / kîlo / tirî / digire / panot

**2- Beşên hevokan bigihînin hev.**

1b, 2a, 3d, 4c

**3- Hevokên li jêr sererast bikin.**

1) Zebeşek bi çiqasî ye?
2) Kîloya tiriyê bi çend panotan e?
3) Nîv kîlo dendikên gulan çiqas digire?
4) Libet kelem bi çar panotan e.
5) Baqet bexdenûs bi bîst û pênc qurişan e.
6) Kîloya îsotan bi çendan e?

**4- Cihên vala dagirin.**

yek / sê / pênc / heft / neh / dozdeh / çardeh / şazdeh / hejdeh / bîst / bîst û yek / bîst û sê / bîst û pênc / bîst û heft / bîst û neh / sî û yek / bîst / çil / şêst / heftê / sed / sed û du / du sed /çar sed / şeş sed / neh sed/

**C- HÎNDARIYÊN RÊZIMANÎ**

**1- Lêkerên li jêr bikin raweya fermanî**

bifiroşe/ bifiroşin, bistîne / bistînin, bide/ bidin, bixwe / bixwin, bikelîne/ bikelînin, biqelîne/ biqelînin, rake/ rakin, çêke/ çêkin, rabe/ rabin, hilkişe/ hilkişin

**2- Lêkerên di nava kevanekê de bikin raweya xwestekî.**

1) vexwin, 2) dixwaze 3) bînî, 4) binivîsin, 5) dixwazin, 6) bên, 7) naxwazim

**3- Payeyên rengdêran**

1- bilindtir, 2- mezintir, 3- zêdetir, 4- biçûktir, 5- germtir, 6- bilindtirîn, 7- mezintirîn, 8- dirêjtirîn, 9- navdartirîn, 10- pêştirîn

## UNÎTE 5 JIYAN

**B- DI RÊ DE**

1- Rodî dê biçe dadgehê.
2- Ew ji ber sûcê diziyê di girtîgehê de ye.
3- Dozger cezayekî giran dixwaze.
4- Dê dadger biryara dawîn bide.
5- Piştî dadgehê dê Rodî biçe nivîsgehê.

**C - LI DIBISTANÊ**

**1- Bernameya hefteyî**

1- Rojên pêncşeman waneyên matematîk, îngilizî, kompîtur, wêje, biyolojî û wêneyê hene.
2- Di navberê de ew ê bi hev re sparteka Rojdayê çêkin.

**2- Di fêrgehê de**

1- Li gorî wê dê siware bi enerjiya rojê bixebitin.
2- Bi nêrîna Rojdayê piştî bîst salan mirov dê di bin behrê de bajaran ava bikin.
3- Li gorî pêşbîniya Azad heta bîst salan dê qeşaya li cemseran tev bihele û dinya di bin avê de bimîne.
4- Li gorî mamoste pêşbîniya Azad pêşbîniyeke bedbîn e.
5- Bersivên xwendekaran.

**D-ÇÛNA SÎNEMAYÊ**

**1- Li ser pirsên li jêr bipeyivin.**

**Bersivên xwendekaran**

**2- Pirsên li jêr bibersivînin.**

1. Di rojên pêncşeman de fîlmên nû tên sînemayê.
2. Di sînemeya Metrepolê de dê fîlmê "Bahoz" bilîze.
3. Dîlan li benda fîlmê "Bahoz" e.
4. Dîlan û hevalên xwe dê saet di du û nîvan de biçin sînemayê.
5. Ew ê li ber sînemayê bicivin.
6. Hêlîn dê destûre ji diya xwe bistîne

**E- Saet**

7:05 : Ji heftan pênc dibore. / Heft û pênc deqe.
7:08 : Ji heftan heşt dibore. / Heft û heşt deqe.
8:09 : Ji heştan neh dibore. / Heşt û neh deqe.
9:10 : Ji nehan deh dibore. / Neh û deh deqe.
9:15 : Ji nehan çaryek dibore./ Neh û çaryek e.
9:25 : Ji nehan bîst û pênc dibore. / Neh û bîst û pênc deqe.
10:30: deh û nîv
10:34: Ji yazdehan re bîst û şeş heye. / yazdeh kêm bîst û şeş deqe.
10:40: Ji yazdehan re bîst heye. / Yazdeh kêm bîst deqe.

## SPARTEK

**A- Xebata li ser peyvan**

**1- Peyvên bi dibistanê re têkildar di nav xelekan de binivîsin.**

fêrgeh / wane / depreş / rastkêş / ezmûn / rûniştgeh / nexşe / pol / jêbir / qelemtraş

**B- Bikaranîna zimên**

**1- Cihên vala dagirin.**

bikî/ biçim- herim / bimînin / bimînin / bikin / bikevin / biçin- herin / bigerin / biçin – herin / bixebitim

**2- Li gorî agahiyên jorîn Paragrafekê binivîsin.**

*Bêrîvan dê bi vê havînê bi malbata xwe re biçe Behra Wanê. Ew ê li Tetwanê li mala hevalekî bavê wê bimînin. Ew ê li wir bikevin avê. Ew ê biçin ser Kela Wanê. Ew ê li nava bajêr bigerin. Ew ê bi keştiyê biçin Dêra Axtamarayê.*

**3- Bersivên xwendekaranz**

4- **Saet**

**3:08** Ji sêyan heşt dibore. / Sê û heşt deqe.
**2:10** Ji duyan deh dibore. / Du û deh deqe.
**8:15** Ji heştan çaryek dibore. / Heşt û çaryek
**6:22** Ji şeşan bîst û du dibore. / Şeş û bîst û du deqe.
**7:25** Ji heftan bîst û pênc dibore. / Heft û bîst û pênc deqe.
**10:30** Deh û nîv
**2:34** Ji sêyan re bîst û şeş heye. / Sê kêm bîst û şeş deqe.
**3:50** Ji çaran deh heye. / Çar kêm deh deqe.
**1:45** Ji duyan re çaryek heye. / Du kêm çaryek.
**12:53** Ji yekê re heft heye. / Yek kêm heft deqe.
**11:19** Ji yazdehan nozdeh dibore. / Yazdeh û nozdeh deqe.
**9:59** Ji dehan re yek heye. / Deh kêm yek deqe.

**5- Rast û çewt**

1) çewt, 2) rast 3) çewt, 4) rast 5) rast

## UNÎTE 6 HOBÎ

**A- ÇÛNA ŞANOYÊ**

1- Heta êvarî çar saet dema wan heye.
2- Ew bernameya şanoyê bi telefonê hîn dibin.
3- Dîlan hejmara telefona şanoyên dizane.
4- Di şanoyê de lîstika Mişko dilîze.
5- Lîstik saet di pêncan de dest pê dike.
6- Azad diçe bîletan dikire.

**B- GUHDARIYÊ MUZÎKÊ**

**1- Bersivên xwendekaran.**

**2- Cihên vala dagirin.**

1) amûra, 2) stranbêjeke, 3) strana, 4) dengbêj, 5) dilsoj, 6) dûr

**5- Tu ji muzîkê hez dikî?**

1- Diyar ji stranên dengbêjiyê hez dike.
2- Azad ji stranên govendê hez dike.
3- Diyar herî zêde ji Karapetê Xaço hez dike.
4- Azad ji dengê Muradê Kinê hez dike.
5- Azad ji kilama Lawikê Metînî hez dike.

**C- WERZÎŞ**

1- Bersivên xwendekaran.

**2- Tu ji werzîşê hez dikî?**

1- Diyar ji avjeniyê hez dike.
2- Azad ji goga piyan hez dike.
3- Diyar li parkê dimeşe.
4- Meş ji bo tenduristiya mirov baş e.
5- Azad roja çarşemiyê goga piyan dilîze.

**D- RÊZIMAN**

1- Bersivên xwendekaran.

**2- Lêkera karînê bikişînin.**

1- dikarî, 2- nikarin, 3- dikarin, 4- dikarin, 5- nikarim

**3- Lêkera bingehîn li gorî cînavkan bikişînin.**
1- bigire, 2- bikin, 3- çêkî, 4- bajon, 5- biçînim

**E- EZ DIKARIM AVJENIYÊ BIKIM**
1- Hêlîn dikare avjeniyê dike.
2- Rojda basketbolê bilîze.
3- Hêlîn dikare tembûr û bilûrê lê bide.
4- Rojda dikar stranan bibêje.
5- Hêlîn dixwaze Rojdayê hînî lêdana bilûrê bike.

**F- AZADA ÇÛ PIRTÛKXANEYÊ**
**1- Bersivên xwendekaran.**
**2- Pirsên li jêr li gorî nivîsê bibersivînin.**
1- Azad duh çû pirtûkxaneyê.
2- Wî du pirtûk wergirtin.
3- Azad meha çûyî sê pirtûk xwendin.
4- Kêfa wî ji pirtûka Çîrokên Gelêrî re hat.
5- Kêfa wî ji çîroka Rustemê Zal re hat.

**G- GEŞT Û SEYRAN**
1- Dilhat û hevalên xwe çûn ser Kela Wanê.
2- Ew bi erebeya Reşo çûn.
3- Ew piştî taştê hilkişiyan serê kelê.
4- Hin zarokan ji wan re qala dîroka Kela Wanê kir.
5- Ji ser kelê dîmenê bajêr pir xweş e.
6- Di firavînê de masî xwarin.
7- Wan li ber tembûrê govend girt.

**SPARTEK**

**A- XEBATA LI SER PEYVAN**
**1- Cihên vala dagirin.**
hunermendî / strana / werzîşê / avjeniyê / tenduristiyê / şanoyê / lîstika / çîroka

**2- Neçîra peyvan**
1- helbest
2- geşt
3- avjenî
4- werzîş
5- şano
6- bilûr
7- dengbêj
8- havîn

**B- XWENDIN**
**1- DÎLAN ÇÛ SEYRANÊ**
**a- Bersivên van pirsên li jêr bide.**
1- Ew pêr çûn geşt û seyranê.
2- Ew çûn ber çemê Dîcleyê
3- Ew li cihekî xweş rûniştin.
4- Zarok li derdorê geriyan.
5- Bavê Dîlanê ji zarokan hêlekan çêkir.
6- Wan di firavînê goşt xwarin.
7- Piştî firavînê Sîdar û Tacdîn ketin avê.
8- Hogir masî girtin.
9- Ew serêvarkî vegeriyan malê.
10- Ji ber ku gelekî westiyan.

**b- Beşên hevokan bigihînin hev.**
1d, 2e,3b, 4a, 5c

**2- ROJAN ÇÛ MÛZEXANEYÊ**
1- Ew çû mûzexaneyê.
2- Bavê wî ew bir mûzexaneyê.
3- Li mûzexaneyê pêşangeha tiştên kevn û dîrokî hebû.
4- Herî zêde xemlên jinan bala wî kişand.
5- Gerînendeyê mûzexaneyê qala şaristanî û serdemên berê kir.
6- Li mûzexaneyê nivîsên bizmarî hebûn.

**C- HÎNDARIYÊN RÊZIMANÎ**
**1- Di hevokên li jêr de lêkeran li gorî dema boriya têdeyî bikişînin.**
1) kir, 2- şûştin, 3- vegeriya, 4- birim, 5- nas kirin,
6- şikand, 7- avêt, 8- rabû, 9- gihîştim, 10- peht
**2- Bi van peyvan li gorî forma karînê hevokan saz bikin.**
1- Ez nikarim avjeniyê bikim.
2- Tu dikarî goga piyan bilîzî.
3- Em dikarin bi îngilîzî biaxivin.
4- Dîlan nikare wêneyan çêke.
5- Hûn dikarin stranan bibêjin.
6- Sîdar dikare tembûrê lê bide.
7- Sînem nikare helbestan binivîse
8- Ez dikarim xwarinê çêkim.

## UNÎTE 7 CIH Û WAR
**A- CÎHAN**
**Kî dizane?**
1- c, 2-b, 3-d, 4-d, 5-b, 6-c

**B- BAJAR**
**1-Hevpeyvîn**
1- Agirî bajarekî dîrokî û mezin e.
2- Bajar navê xwe ji Çiyayê Agirî digire.
3- Hejmara şêniyê navenda bajêr nêzîkî hezar kesî ye.
4- Çemê Muradê di nav Agiriyê re derbas dibe.
5- Li Bazîdê Qesra Îsheq Paşa heye.
6- Gora Ehmedê Xanî li Bazîdê ye.

**2- Bersivên xwendekaran.**
**C- TAXA ME**
**Qada Îstasyona Trênê**
1- Îstasyona trênê di navenda Amedê de, li derveyî sûran e.
2- Kolana Mêrg Ehmed ji navenda sûran dest pê dike.
3- Kolana Îstasyonê ji Deriyê Rihayê dest pê dike.

4- Kolana Îstasyonê li Qada Îstasyonê bi dawî dibe.
5- Park Sumerê li hemberî îstasyonê ye.

**D- AVAHIYA ME**
1- Hêlîn nameyê dişîne.
2- Sorgul nameyê digire.
3- Mala Hêlînê di avahiyeke mezin û bilind de ye.
4- Avahî yazdeh tebeqe ye.
5- Di her teqebeyê de çar mal hene.
6- Ew di şaneşînê de li hawirdorê temaşe dikin.
7- Di xênî de asansor heye.

**E- ODEYA HÊLÎNÊ**
1- Di odeya Hêlînê de du pace hene.
2- Paceya aliyê rastê pirtûkxaneyeke mezin heye.
3- Cildank li aliyê çepê yê pirtûkxaneyê ye.
4- Televîzyon di nava pirtûkxaneyê de ye.
5- Li ber paceya aliyê çepê nivîngehek heye.
6- Xalîçe li ber komîdîn û şifonyer raxistî ye.

**F- RÊZIMAN**
**2- Cihên vala dagirin.**
1- li, 2- ser, 3- di, 4- ber, 5- bi, 6- bi, 7- ji, 8- di

## SPARTEK

**A- XEBATA LI SER PEYVAN**
**1- Cihên vala dagirin.**
1- bajarê, 2- welatê, 3- ala, 4- taxa, 5- zimanê,
6- tixûbê, 7- navçeya, 8- gundekî, 9- kuçeyeke

**2- Neçîra peyvan**
1- şaneşîn
2- xanî
3- mal
4- cildank
4- serşok
5- paldank
6- têkber
7- palgeh
8- dîwan
9- hol
10- pirtûkxane

**3- Cihên vala dagirin.**

| WELAT | NETEWE | ZIMAN |
|---|---|---|
| **Tirkiye** | tirk | **tirkî** |
| Almanya | **alman** | almanî |
| Îran | fars | **farisî** |
| Amerîka | amerîkî | **îngilizî** |
| **Japonya** | **japon** | japonî |
| Kûba | **kûbayî** | **îspanî** |
| **Kurdistan** | kurd | **kurdî** |
| Fransa | **fransî** | **fransî** |
| **Ermenistan** | ermenî | **ermenkî** |
| Sûriye | ereb | erebî |
| Îsraîl | **cihû** | îbranî |

**B- XWENDIN**
**1- Bajarê me**
Rast û çewt
1-rast, 2- çewt, 3- rast, 4- rast, 5- çewt, 6- çewt,
7- rast, 8- rast, 9- çewt, 10- rast

**2- Wendy qala welatê xwe dike**
1- Hollanda li ser parzemîna Ewropayê ye.
2- Li rojhilata Hollandayê Almanya heye.
3- Nifûsa wê şazdeh milyon e.
4- Sîstema desthilata Hollandayê parlamenterî ye.
5- Zimanê fermî yê Hollandayê hollandî ye.
6- Navê paytexta Hollandayê Amsterdam e.
7- Li bajarê Rotterdamê bendereke navneteweyî heye.
8- Bi dewlemendiya cureyên gulan navdar e.

**3- Deriyên Sûrên Amedê**

**Beşên hevokan bigihînin hev.**
1d, 2c, 3f, 4a, 5b, 6e, 7g

**C- HÎNDARIYÊN RÊZIMANÎ**
**1- Daçek**
1- li, 2- di/de, 3- di/re, 4- ji/re, 5- ji, 6- bi/ ve, 7- bi/ve,
8- ji/ve, 9- bi, 10- ji/ve
**2- Peyvsazî**
1- çavşîn, 2- rojhilat, 3- yekşem, 4- pismam,
5- dotmîr, 6- dilxweş, 7-depreş, 8- demsal,
9-şevbaş, 10- salname, 11- rêziman

## UNÎTE 8 PÊŞKETIN

**A- TÊKBERÊN ELEKTRONÎK**
**1- Cihên vala dagirin.**
1- cilşo, 2- tozmij, 3- firaqşo, 4- firin, 5- kompîtur,
6- televîzyon, 7- sarinc, 8- şofben

**2- Kirîna têkberan**
1- Şermîn dixwaze çilşo, sarinc, firin, tozmij, televîzyonê bikire.
2- Ew ê firaqşoyê nekirin.
3- Ew ê niha înternetê girê nedin.
4- Kawa û Şermîn diçin firoşgehê.

**3- Li malê têkberên elektronîk**
1- Ji ber ku li malê gelek karê wê hebû.
2- Binevşê taştê amade kir, nava malê malaşt, mal berhev kir, firaq xistin firaqşoyê, kinc raxistin.
3- Di mala Gulçînê de karên malê Ferzende dike.
4- Ji ber ku karê wî zêde ye.
5- Gulçînê ji bo Binevşê çay û paste amade kirin.

## B- KOMPÎTUR Û ÎNTERNET

**1- Bersivên xwendekaran**

**2- Pirsên jêrîn bibersivînin.**

1- Ji amûrên serdema nû ya herî girîng kompîtur e.
2- Ew nivîsên xwe li ser kompîturê dinivîse û înternetê bi kar tîne.
3- Em dikarin bi riya înternetê gelek agahiyên pêwîst peyda bikin, tîşkenameyan bişînin.
4- Mirov dikare bi riya peyamhinêrê bi hevalên xwe re bipeyive.
5- Tîşkenameyan cihê nameyan girtiye.
6- Mirov dikare peyaman ji hevalên xwe bişîne, guhdariya radyo û muzîkê jî bike.

## C-WEŞANA BI KURDÎ

**1- Kî dizane?**

1-d, 2-b, 3-c, 4-c

**2- Çapemeniya kurdî**

1- Yekemîn rojnameya kurdan Kurdistan e.
2- Rojnameya Kurdistanê li Qahîreyê dest bi weşanê kiriye.
3- Rojnameya Kurdistanê ji hêla Mîqdat Mîthat Bedirxan ve hatiye weşandin.
4- Di destpêka sedsala bîstan de kovarên mîna Jîn, Hetawî Kurdî, Rojî Kurd, Kurdistan.
5- 15'ê gulanê ango roja derketina kovara Hawarê.
6- Niha rojnameyên Xebat, Azadiya Welat û Kurdistanî Nwê bi kurdî rojane weşanê dikin.

**3- Radyo**

1- Şerq el Adna, 2- Brîtanyayê, 3- 1929'an, 4- Radyoya Erîvanê, Radyoya Tehranê, Radyoya Baxdayê.
5- Dengê Amerîkayê, Dengê Mezopotamya, Kurdistan Radio, Newa Kurd Radio, SBS-Kurdî, Radyo Zeyale

**4- Televîzyon**

1- Yekemîn televîzyona bi kurdî Xebat Tv ye.
2- Xebat Tv di sala 1992'yan de dest bi weşanê kiriye.
3- Yekemîn televîzyona peykî Med Tv ye.
4- Roj Tv, MMC, Kurdistan Tv, KurdSat, Zagros Tv, Newroz Tv, Rojhilat Tv, Tishk Tv, Komala Tv, Sahar Tv

## SPARTEK

## A- XEBATA LI SER PEYVAN

**1-Xaçepirs**

1-cilşo, 2- firaqşo, 3- rojname, 4- malper, 5- kovar, 6- name

**2- Cihên vala dagirin.**

1- cilşoyê, 2- namedanka/ tîşkenameyên, 3- malpera, 4- peyamhinêrê, 5- firaqşoyê, 6- tozmijê, 7- sarincê

## B- XWENDIN

**1- Pirsên li jêr bibersivînin.**

1- Bêtêl û birûske di sala 1894'an de ji hêla Oliver Lotge ve hatiye îcadkirin.
2- Weşana televîzyonê cara yekemîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kir.
3- Li Tirkiyeyê weşana rengîn di sala 1984'an de dest pê kir.
4- Navê mucîdê telefonê Graham Bell e.
5- Bi vedîtina telefonê re mesafeya di navbera mirovan de ji holê rabû.
6- Îro bi telefonê em dikarin wêne û dîmenan bikêşin, dengan tomar bikin, peyaman bişînin û bikevin înternetê.

## C- HÎNDARIYÊN RÊZIMANÎ

**1- Van hevokan li gorî demên destnîşankirî biguherînin.**

1- Li ber mala me dibistaneke nû hat avakirin.
2- Par zêdetirî sed pirtûkên bi kurdî hatine weşandin.
3- Îsal li Amedê mîhrîcaneke mezin tê lidarxistin.
4- Li Amedê fîlmê Bahoz dê bê nîşandayîn.
5- Di destpêka sedsala nozdehan li Stenbolê gelek kovarên kurdî hatin weşandin.

**2- Cihên vala bi lêkera alîkar a avaniya tebatî dagirin.**

1- hatin, 2- tên, 3- bê, 4- hatiye

**3- Van hevokên bi avaniya lebatî bixin forma tebatî.**

1- Rojnameya Kurdistan di sala 1898'an de ji hêla Mîqdat Mîthat Bedirxan ve hate derxistin.
2- Nûbara Biçûkan di sala 1684'an de ji hêla Ehmedê Xanî ve hate nivîsandin.
3- Radyoya Levant di sala 1941'ê de ji hêla hikûmeta Fransayê ve hatiye avakirin.
4- Heta niha zêdetirî deh televîzyonên peykê ji hêla kurdan ve hatine avakirin.
5- Her sal 22'yê rêbendanê de avabûna Komara Mehabadê ji hêla kurdan ve tê pîrozkirin.
6- Sala bê dê gelek parkên nû ji hêla Şaredariya Amedê ve bêne vekirin.

**4- Van hevokên dema boriya têdeyî, bikin dema boriya dûdar.**

1- Teknolojiya radyoyê ya pêşketî guherînên nû afirandine.
2- Weşana televîzyonê cara yekemîn di sala 1936'an de li Londonê dest pê kiriye.
3- Li Tirkiyê weşana televîzyonê cara pêşî di sala 1970 de pêk hatiye.
4- Mucîdê mezin Graham Bell di sala 1876 de telefon îcat kiriye.
5- Şerefxanê Bedlîsî pirtûka xwe ya dîrokê Şerefname di sala 1597'an de qedandiye.

# HÎNKER Asta Yekemîn

Ev pirtûka li ber destên we, pirtûka asta yekemîn a setekê ye. Ew seta ku ji sê pirtûkan pêk tê ji hêla Komîsyona Materyalan a TZPKurdî ve tê amadekirin.


Bi vê pirtûka asta yekemîn dê kesên ku qet bi kurdî (zaravayê kurmancî) nizanin bikaribin li gorî mijarê peyv û têgihên pêwîst û mijarên rêzimanî yên bingehîn hîn bibin û bi hîndariyên cur bi cur behremendiya xwendin, têgihîştin û nivîsandina kurmancî bi pêş bixin.

Ev pirtûk bi rênîşanderiya mamosteyan dê kesên ku dixwazin kurmancî hîn bibin, bigihîne asta duyemîn.

**Di vê pirtûkê de ev xal hene;**

- *Diyalog û nivîsên kurt û sivik*
- *Pirs û xaçepirsên bikaranîna zimên*
- *Mijarên rêzimanî û hîndariyên têkildarî wan*
- *Li dawiya her unîteyê spartekên bi hîndariyên cur bi cur*
- *Lîsteya lêkeran bi kişandina li gorî dema borî û dema niha*
- *Bersivdanka hîndarî û spartekan*

**ENSTÎTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ**



ISBN 978-975-6282-45-8
9 789756 282458